Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal de

Hejmar: 125
21'ê Çileya Pêşîn a 2009
Buha: 150 Tûmen

agirî

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

Pîroz e Yelda, Şeva Jidayîbûna Dr. Qasimlo

Şeva Yelda yan jî Şeva Çile, dirêjtirîn şeva salê û yek ji kevintirîn cejnên kultora Rojhilatê ye. Yelda dawîn şeva Payîzê û destpêka demsala Zistanê ye.

Cejna Şeva Yelda her sal li Kurdistanê de birêve diçe. Lê ji bo me Kurdan taybetmendiyek din jî heye. Ew jî şeva jidayîkbûna mêrxasekê ye ku bi dîtin û ramanên bilind yên xwe, tarîtiya Sedsalekê şikand.

Şeva Yelda ji we pîroz û bi hevîya bihara Azadiyê

Pêşmerge Sembola Îradeya Yekgirtî A Gelê Kurd E



Daxuyaniya Komîsyona Ragihandina PDK Îranê Derheq Koça Dawiya Ayetula Husên Elî Muntezirî R: 7

Rûpela 2

Daxuyaniya Hevbeş, Derheq Biryara Daxistina DTP'ê

Rûpela 3

Daxistina DTP'ê, Li Berjewendiya Tundrewande

Rostem Cehangîrî

Rûpela 5

Dîsan Deriyên Daxistî

Ebdullah Hicab

Rûpela 6

Cinayetek Sîstimatîk Û Pîlanek Veşartî

Nûredîn Sofîzade

Paşkoya Taybet

Daxuyaniya Hevbeş Derheq Biryara Daxistina DTP'ê

Roja Înê, 11.12.2009'an, Dadgeha Yasaya Bingehîn ya Turkiyê, biryara daxistina Partiya Civaka Demokratîk (DTP)'ê bi tometa hevkarîkirin bi terorîzmê re derkir. Hevdem Ehmed Turk, Serokê vê partiyê û Aysel Toxlok jî ji endametiya Parlimanê û 37 Polîtîkar û kesayetiyên ser bi vê partiyê bo heyamê 5 salan ji kar û çalakiyên siyasî bêpar bûn û endametiya li her partiyek din de ji wan re hat qedexe kirin.

Ev biryare li demekê de tê dayîn ku heyamekî berî niha pêvajoya vebûna Demokratîk û dabînkirina hin mafên despêkî yên gelê Kurd li vî welatî de destpêkiribûn û dihat çavnihêrî kirin ku doma vê pêvajoyê, bi encamek baş û bi qazanca kurdên Turkiyê û welatê Turkiyê bi giştî tewaw bibe. Lê bêşik biryara han dikare bibe astenga ser riya vê pêvajoyê. Bi awayekê ku her niha bûye sedema alozî û nearamiyên zêdetir li wî welatî de.

Em serbarê mehkûmkirina hukmê dasepandî yê dedgeha Destûrî ya Turkiyê bi ser DTPê de, hêvî dikin ku pêvajoya "Vebûna Demokratîk" bi rûyê Kurdan de berdewam û bi encam be.

Herwiha hêvî dikin ku xûşk û birayên Kurd û dewleta Turkiyê, bikarin bi hevkariyên zêdetir ji rêya borîn ji vê tengasiyê de, alîkar û piştevanê ber bi pêşdeçûna gavên prsosesa Siyasî û Demokratîk li vî welatî de bin.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê
Komeleya Şoreşvanên Zehmetkêş yên Kurdistana Îranê
Saziya Xebata Kurdistana Îranê
Parta Azadî a Kurdistanê
14.12.2009

Daxuyaniya Hevbeş:

16ê Sermawezê, Roja Yekêtiya Xwendekaran Û Bizava Azadîxwaziya Gîştî Dijî Serberdayiyê

Wek diyar û eyan, 16ê sermaweza îsal bû bi roja hevxebatî û yekêtî û yekrêziya bizava xwendekarî. Xebata bizava nerazî dijî sîstema Wilayeta Feqîh li roja xwendekar de, carek din nîşan da ku rewatî û şerîyeta herifyayî ya desthilata serberdayî ya ayînî bi zora çekê û tepeseriyên bêrehmane, nekariye xebata xelkê û xwendekaran bitemrîne û herwiha herifîn û hiloşîna rewatiya xwe li pêş çawên cîhanê jî veşêre.

Komara Îslamî vê carê jî nekarî civaka Îranê bike bi goristanek bêdeng vê carê jî hawar û gaziya bihest û bicoş ya xwendekaran li roja 16ê Sermawezê de li dijî rejîmê û hêzên tepeserkar yên wê, deng veda.

Berî her tiştî, divêt îradeya xebatkarane ya xwendekarên azadîxwaz û mikûrbûna wan li ser birêvebirina roja xwendekar de, bilind bihê nirxandin.

Bêguman bizava xwendekarî selimand ku li rewşa aloz û tundûtûj ya zal bi ser Îranê de, yek ji dînamîzmên bihêz yên xebat dijî dîktatoriya desthilatdar bo gihîştin bi azadî û demokrasiyê ye û li gorîbûn li vê rêyê de tu tirsek nine.

Girtin û destbiserkirina berfireh a xwendekaran ji aliyê hêzên ewlekar ve, bo nimûne xwendekarên Kurd, êrîşa hovene ya besîcî, kinc şexsî û hêzên din yên tepeserkar, ne tenê nekarî wan neçar bi paşekişê bike, ji ber ku rijdtir ji her demekê, xwendekar li ser xwast û dirûşmên xwe pêdagir û sor bûn.

Em serbarê bilind nirxandina xebata xwendekarên azadîxwaz li 16ê Sermawezê de, destbiserkirina xwendekarên xebatkar û bi taybetî yên Kurd ku heya niha hejmara wan ji 16 kesan derbas bûye, herwiha hemû destbiser û girtiyên din ji aliyê hêzên ewlekar ve mehkûm û şermezar dikin û xwazyarê serbest berdana herçiqas zûtir ya wan in.

Li vê zirûfê de hewce ye ku sazî û nawendên navnetewî yên berevankarê mafê mirovan, hevdeng tevî welatên demokratîk yên cîhanê, givaşên zêdetir bixene ser rejîma Komara Îslamî a Îranê ku çi din mafê mirov û bi taybetî mafê xwendekaran binpê neke.

Herwiha riftar û livînên nemirovane û dijî demokratîk yên rejîma Komara Îslamî a Îranê pitir ji her demekê eşkere û mehkûm bikin.

Bo haydarbûna zêdetir, navê xwendekarên destbiser kirî ev in:

Ehmed Îsmaîlî, Armanc Rehîmî, Ebdula Arifî, Pexşan Ezîzî, Leyla Mihemedî, Sirwe Weysî, Hejar Yusifî, Îdrîs Mewlûdî, Emced Kurdnijad, Nasir Ehmedî, Ebas Kakayî, Elîriza Muradî, Secad Muradî, Suhrab Kerîmî, Ferzad Kelbelî û Hejîr Kurdnijad.

Serkevtî be bizava xwendekarî dijî dîktatoriya Komara Îslamî a Îranê

Serkeve avabûna desthilatek Demokratîk a Federalî

Komeleya Şoregêrên Zehmetkêş yên Kurdistana Îranê

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê

Parta Azadî a Kurdistanê

.

www.arsivakurd.org

Rohnkirinek Derheq Du Kiryarên Nebicî û Ne rewa Ku Ji Aliyê Rejîma Îranê Ve Bi Navê PDKÎ Birêve Diçin

Heyamek e ku hin kesên nenaskirî di bajarê Urmiyê û deverên derdora wî bajarî de, dest bi nivîsandina dirûşman bi dijî Partiya Kedkarên Kurdistanê (PKK) kirine û di bin her dirûşmekê de jî navê PDKÎ nivîsandine!!

Ev kiryara bipîlan ya di devera "Soma"yê, di xwendingehên bi navê Îmam Xumêynî û Taliqanî de birêve çûye û hatiye zanîn ku ew kiryare, bûye sedema nerihetî û hêrsbûna xwendekarên Kurd û welatparêzên wan xwendingehan.

Herwiha hatiye zanîn ku di devera Selasa Bawecanî de, dîsan hin kesên nenaskirî, dest bi azar û ezyeta xelkê wê deverê bi navê PDKÎ ve kirine, herwih dest bi lêdan û kutana xelkê û ji kasibkarên wê deverê pere distînin.

Hêjayî gotinê ye ku tu partiyeke xebatkar û pêşkevtî, kiryarên bi wî awayî encam nade û ew kiryarane tenê ji aliyê wan kesan ve tên encamdan ku kirêgirtiyên rejîma Komara Îslamî a Îranê bin. Pêwîst s xelkê çawekirî yên Kurdistanê ji wan Pîlanên rejîmê haydar bin û wan pîlanan betal bikin.

Komîsyona Rêxistina PDKÎ radigehîne ku ew kesên ku van cure kiryarane dikin tu peywendiyek bi PDKÎ ve ninin.

Daxistina DTP'ê, Li Berjewendiya Tundrewan de

Rostem Cehangîrî

Roja Înê, 11.12.2009'an, Dadgeha Yasaya Bingehîn a Turkiyê, bi tometa hevkariya bi –terorê- û bi xeterxistina tenahî û asayişa welat, biryara daxistina DTP'ê di bin Serokatiya Kesatiyê nermrew, anku Ehmed Turk de derikir û xebata siyasî jî ji 37 berpirsiyarên wê qedexe kir.

Piştî kudetaya leşkirî ya salên 80'ê heya niha, eva Partiya 25'mîn e ku tê girtin, ku li nava wan de 6 partiyên kurdî tên dîtin. Lê niha rewş û kawdan hatiye guhertinê. Em dikarin bibêjin ku civaka Turkiyê bi nisbet salên 80'ê û 90'ê gelek ferq kiriye. Tê bîra min Ku li sala 1993'ê de, dema ku Dadgeha Bingehîn a Turkiye dîsan biryar girt ku Parlementerên Kurd ku bi dengê xelkê hatibûn hilbijartin, bi zora polîs û hêzên ewlekar yên Turkiyê li hola perlementoyê de derxistin û rapêçî girtîgehê kirin. Wê demê li nav civaka turk de tu dengek nerazî li hemberî wê kiryara kirêt û dijî yasa û rîsayên demokratîk de, ne hat dîtin û ne jî hat bihîstin. Lê vê carê rewş, tam berevaj e. Ne tenê rewşenbîr, akademîsyen, demokrat û çepên turk, gelê kurd bi tenê nehiştin, belkî kom û Saziyên sivîl, medya û ragihandin, nemaze parek ji leşkiran jî nerazîbûna xwe anîn ziman û ev gav mehkûm kirin. Herweha dan zanîn ku biryar yasayî nine, jiberku tam siyasî ye. Heta kar gihîşte astekê ku Serokwezîrê Turkiyê li Konfernsek Çapemeniyê de ragihand ku "Turkiya bûye goristana Partiyên Siyasî, eva bo Turkiyê eybek mezin e û divêt çareseriyek jêre bihê dîtin".

Dadgeha Destûrî ya Turkiyê ji 11 endaman pêK tê. Bona biryargirtinê, hewcehî bi zorahiya dengan, anku 7 dengên erê heye. Sala borî mijara daxistina Partiya desthilatdar ya AKP'ê jî kete rojeva karê dadgehê, lê jiber wê ku 6 dengên erê hebûn, biryara daxistinê nehat pesendkirin. Lê li ser dosyaya daxistina DTP'ê her 11 endamên Civata Dadgehê, dengê erê dan. Eva jî bûye cihê pirsiyar û nerazîbûnê ku çima DTP bi piraniya dengan tê daxistin, lê bo AKP'ê newisa bû. Gelo tu bêjî sedem tenê kurdbûna vê Partiyê nebe?!

Pirsiyarek din jî ku niha li rojevê de ye, ev e ku serbarê daxistina DTP'ê, başe çima Hevserokê wê û 37 polîtîkarên ser bi vê Partiyê ji kar û çalakiyên siyasî hatin bêparkirin?

Ji hêla din ve jî Ehmed Turk bi berhevdan li gel zaf endamên din yên DTP'ê, kesatiyekî zêde nermrew e, tim alîgirê diyalog û aştiyê, dijî şer û xwînrijiyê bûye. Başe çima Ehmed Turkê nermrew ji siyasetê tê dûrxistin, lê yên tundrew di çarçoveya biryarê de cî negirtin? Wisan dixuye ku ew jî tundrewan dixwazin!!

Niha em dibînin serbarê wê ku DTP'ê li dijkiryarekê de biryar girtiye ku her 19 parlemanterên din yên xwe ji parlimentoyê vekişîne, lê ger ji vê biryarê jî peşîman bibe, dîsan pirsgirêkek din heye ku li gor yasaya Turkiyê divêt her girûp û feraksiyonek li nav perlementoyê de xwediyê 20 endaman be. Lewre DTP bi 19 parlimentaran, automatîk tê hiloşîn. Lê niha hewlek din heye ku endam Perlemanek din razî bikin heya ku tevlî girûpa wan bibe û bibin bi 20 kes û bikarin xebata xwe li Parlimentoyê de bidomînin.

Pirsgirêka din jî ev e ku niha Parlemana Turkiyê 27 endam parliman kêm hene û li gorî Yasaya Bingehîn, ger Parlemantarek din îstifa bike, Perleman rewatî û meşrûîyeta xwe ji dest dide û dibe hilbijartina miyandewreyî û pêşwext birêve biçe.

Lewma niha girtina DTP'ê û îstifaya parlimenterên kurd, dengvedanek pir mezin li asta cîhanî de vedaye û derbekî giran e li Turkiyê û demokrasiya wê. Çunku li rastî de

Turkiya bi vê biryarê, ber bi paşve gavan hildigre. Lewre carê nikare tevlî dunyaya pêşketî bibe. Eva jî li halekê de ye ku çendîn sal e Turkiya hewil dide li YE'ê de weke endam bihê wergirtin.

Serbarê hemû evane, niha zext û givaşên zaf ji aliyê dilsojan ve li ser DTP'ê hene ku endamên xwe ji parlimanê paşde nekişînin û bi navê Partiyek nû kar û xebatên xwe bidomînin, heya ku rewş ji vê yekê xirabtir nebe. Çunku niha li hemû gund, bajar û bajarokên Kurdistana Turkiyê de serhildan û alozî çêbûne, bi dehan kes hatine kuştin û birîndarkirin, bi sedan kes jî hatine girtin. Bi giştî niha rewş tevlihev bûye û tirsa vê yekê heye ku şerê kurd û turk rû bide û ziyanê bigehîne biratiya wan. Li rastî de jî eva armanc û daxwaza tundrewên her du aliyan, bi taybetî tundrewên turk e ku bi "gurên bor" tên naskirin.

Lewre ez li ser vê baweriyê me ku DTP hevdem li gel pêşvebirina daxwazên xwe bi rêyên demokratîk, berdewamiya xebata xwe li Parlementoyê de û pêkanîna partiyek nû, nabe rewşê bi qazanca wan aloz bike, çunku heya vê gavê ne tenê rewş, ji ber ku raya giştî ya Kurd û turk, ya YE'ê û raya giştî ya cîhanê jî li berjewendiya kurdan de ye û li egera alozî û tundûtûjiyên zêdetir de renge rewş bê guhertin û wê demê tenê kurd dê zirarê bibînin. Lewma divêt ji vê derfet û delîveya ku hatiye pêş, mifahek baş bistînin, nexa renge sibê pir dereng be.

www.agirî.org

Daxistina DTP'ê, Vegeriyan Bo Xala Sifr A "Vebûna Demokratîk"

Selîm Zencîrî

Li demekê de ku midehê çend mehan e Partiya desthilatdar û Hikûmeta Turkiyê bas ji proseya reformên demokratîk û vebûna bi rûyê kurdan de dikin û hêvî û çirûskek bo çareseriya doza dehan saliye kurd li Turkiyê de dihatin dîtin, lê mixabin roja Înê 11.12.2009'an, Dadgeha Destûrî ya Turkiyê bi biryarek neadîlaneya siyasî bi piraniya dengan, daxistina Partiya Civaka Demokratîk(DTP) ragihand. Bi vî awayî jî hemû xewn, hêvî û hewlên aştîxwaz û azadîxwazan binax kir û carek din siya reş û şûm a tundûtûjiyê bi ser asîmanê Kurdistana Turkiye de sepand, herweha ken û şadî jî xiste ser lêvên neyar û dijberên kurd û çareseriya doza rewa ya wan.

Li gor biryara vê bêdadgehê, daxistian vê partiyê ku bi şeşem Partiya Siyasî a daxistî ya kurdan li van du dehsalên dawîn de tê hesibandin, Ji ber vê ye ku goya – "ew Partiye çavkaniya hemû ew çalakiyan e ku zirarê digihînin serxwebûn û yekêtiya Turkiye"-. Lewma serbarê daxistina vê partiyê, mafê endametiya parlimanê ji Ehmed Turk (Hevserokê DTP'ê) û Aysel Toxloka Cihgira Serok stand û 37 Polîtîkar û berpirsên ser bi vê Partiyê jî bo midehê 5 salan ji kar û çalakiyên siyasî bêpar hiştin ku navê Leyla Zanaya wergira xelata Saxarofê jî têde tê xuyakirin. Eva jî li halekê de ye ku Ehmed Turk endametiya navhatî li Partiya xwe de ret kir. Herweha li gor vê biryarê dest bi ser hemû darayî, emwal û bargehên vê partiyê de tê girtin.

DTP take partiya bihêz ya kurdî ye ku bi awayek legal nûneratiya îradeya siyasî a zorahiya gelê kurd li Turkiyayê de dike û xwediyê 21 kursiyên parlimentoyê ye. Herweha 98 şarevaniyên Turkiyê ji li dest de hene. Lewre daxistian vê Partiyê li vê dema hesas û dijwar ya Turkiyê de bûye cihê nîqaş û rojeva medya û nawendên siyasî yên cîhanê û bi taybet li Turkiyayê. Vê biryarê, helwestên cîhanî jî bi dû xwe re anî. Li vê derheqê de Yekêtiya Ewrpayê nîgeraniya kûr a xwe da eyanê û ew biryar, bi zirar bo ser demokrasî û astenga ser riya aştî û prosesa demokratîzasiyonê li vî welatî de zanî, herweha Turkiya jî ji xeterî û metirsiya vê biryarê haydar kir. Ji aliyê dinê jî Amerîkayê her çend ku ew biryar bi pirsek navxweyî ya Turkiyayê hesiband, lê daxwaz kir ku Turkiya rêz ji azadiya siyasî ya şaromendên xwe bigre û biryara han jî bi dijî prosesa Vebûna Demokratîk dazanîn. Herweha DTP'ê jî li gav û provaksiyonek bi nisbet vê biryarê, her 19 perlimantarên xwe ji parlimentoyê vekişandin.

Bi daxistina DTP'ê wisan dixuye ku ne tenê bîr û hizra Kemalîstî û îdeolojiya tepeserî û asmîlasiyonê kal û kêmreng nebûye, ji berku gellek bihêz û serdeste jî. Ji aliyekê xebat û tekoşîna çekdarî ya kurdan bi -terorê- girê dide û ji aliyê dinê jî tab û tehemula siyaseta legal ya kurdan nake. Eva jî eyankerê vê yekê ye ku hemû rêyekê ji kurdan digre û nîşan dide ku siyaseta înkar û helandinê serbarê hin taktîk û durûtiyên siyasî bi merema xapandinê, herwisan berdewam e, û qazanc û berjewendiyên xwe tenê li berdewamiya şidet, nearamî û çaresernekirina pirsa kurd li Turkiyê de dibînin. Lewre herwek dihat çawnihêrî kirin, vê biryarê pêlek nû ji alozî û tund û tûjî li dû xwere aniye ku rengê vê hindê dide bibe bi kirîzek mezin. Herweha nîşan dide ku Hikûmeta Turkiyê heya niha li hevaletî û biratiya bi kurdan û mafên rewa û berheq yên wan de rûrast û sadiq nebûye û bi vê biryarê jî ew pirtik hitbar û baweriya ku ji kurdan xapîbûn, jidest dan.

Jiber vê ku ew biryar ne tenê ya Dadgeha Makezagonê ye, ya hikûmetê ye jî. Çunku dadgeh li xizmeta vê hikûmetê de ye, lewre herdu li vê meseleyê de wekîhev tawanbar û berpirsiyar in. Çunku du sal bû ku daxwaza daxistina vê partiya kurd li Dadgeha Destûrî de bû û Partiya desthilatdar ku xwe bi alahilgirê reform û prosesa "Vebûna Demokratîk" dizane, dikarî li heyamê wan du salan de bi guhertina Yasaya Partiyên Siyasî, rê ji daxistina vê Partiyê bigre. Li vê navberê de AKP'ê ne tenê hewil neda ku pêşiya vê biryarê bigre, jiberku çend rojan berî biryarê jî, DTP bi alîkar û piştewanê girûpên serhildayî li Turkiyayê de tawanbar kir. Evcar helwesta nerm û tirsinokane ya AKP'ê piştî biryarê, vê yekê diselimîne ku

ne tenê nerihetê daxista DTP nine, belkî haydarê biryarê û renge piştevaniya vê jî kiribe.

Daxistina DTP'ê li vê qonaxa hesas de serbarê vê ku bêşermî û xalek reş e li eniya hikûmetê, herweha derbek giran e jî ku li peykera nîvrih a demokrasiyê û pêvajoya aştîxwaziya li Turkiyê de tê xistin. Ji aliyê dinê jî bîranîna ceribînên tal û nexweş, tepeserî, durûyî û nehametiyên desthilat û hikûmetekê ne ku li vê sedsalê de li pêxem çimisandin û helandina yekcarî ya vî gelê hejar ji her alev û amûrekê mifah standine.

Herwek Ehmed Altan li rojnameya "TEREF" a Turkî de nivîsandiye ku: Hûn bi salan in ku Kurdan dipelixînin, îşkence dikin, digrin û dikujin, Gundên wan kawil û wêran dikin, nemaze xewn û hêviyan jî ji wan heram dikin. Ma gelo hûn têr nebûn ku niha wan ji siyasetê jî dikin? Hûn bi vê biryarê aşitiyê dikujin û welat parçe parçe dikin. Li dawiyê de jî dibêje: Ez bi vê biryarê ji turkbûna xwe şerm dikim.

Li rastî de bi vê biryarê derdikeve holê ku biryarbidestên Turk, hêj ders û şîret ji dîrokê negirtine û ji bîr kirine ku kurd li hemberî her pîlan û kiryareke wan de, piroje û dijkiryarên xwe hene. Bi vê biryarê jî ne tenê ji xebat û tekoşîna bo maf û armancên rewa yên xwe dilsar û teslîm nabin, ji ber ku rijdtir ji caran dê xebata xwe bidomînin. Herweha ev biryar, hewcehiya yekêtî û yekrîziya wan bihêztir û agirê xebata wan jî geştir dike. Çunku ew rewş û zirûfa heta ser dewam nake û bêy çareseriya pirsa kurd û guhertina Destûra bingehîn li vî welatî de ku çavkaniya hemû zulm û nehametiyan e, turk jî azad û serfiraz nabin. Turkiya jî aramî, tenahî û aştiyî bi xwe re nabîne û xewna endametiya wan li YE'ê de jî dê bibe kaos.

Lewre bo rizgarbûn ji vê rewş û zirûfa aloz û bi mij û dûman, hewce ye rê ji bo guhertina Makezagonê bihê xweş kirin, giftogo û diyalogê bi bingeh bihê girtin û vê biryarê jî betal bikin. Herweha kurd jî bi hestkirin bi berpirsatiyê, ji rêya xwenîşandanên aram û dûr ji tund û tûjiyê, dirêji bi xebata xwe heya çareseriyek jêhatî û guncaw bidin. DTP jî endamên xwe ji parlementoyê nekişîne. Çimkî bi tund û tûjî, dûrbûn ji proseya siyasî û nîqaş û biryarên parlimentoyê, xizmetê bi xwest û armancên şovenîstan û dujminên aştî, azadî û demokrasiyê li Turkiyayê de dikin.

www.agirinfo.org

RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

Ebdullah Hicab

Dîsan deriyên daxistî

Girtina partiyên siyasî û qedexe kirina xebata partiyên ku li gor îdeolojiya fermiye dewleta Turk tev negerin, li Turkiyê tiştek nû nîne. Ji Kurdan re jî ne ecêb e partiyek ku basa çareserkirina pirsa siyasiye Kurd bi riya aştiyane bike, li welatekê ku têde Kurd hê weke hevwelatiyên rêza yekê nayên hesibandin, ji aliyê deselatdaran ve neyê tehemul kirin. Di gel wê hindê jî girtina Partiya Civaka Demokratîk, (DTP)ê, di demekê de ku hêvî dihat kirin hin derî bi ser çareserbûna pirsa Kurd de vebin, manayek cuda heye.

DTP ya ku tu gav derfet bi dest nexist bi awayek tewaw azad tevli siyaseta legale Turkiyê bibe, ji ber cewherê xwe yê ji rastiya civaka Kurdistanê nêzîk, pir zû karî baweriya gelê Kurd bidest bixe. Partiyê tu gav nekarî hêza xwe ya rastî u piştgiriya xwe ya gelerî bi wî awayî ku heye di kanalên fermiye deselatê de nîşan bide. Astengiyên li ser riya hilbijartinê, pêşî girtin ji kar u çalakiyên rêxistinê, astengên abûrî û darayî, kêşeyên ku deselata leşkerî ji bo xebata sivîl ya şaredariyên partiyê çê dikir û hwd, DTP xistibûn nava çembera astengî û kêşeyan. Di gel wê hindê jî partî weke nûnerê piraniya xelkê Bakûrê Kurdistanê xwedî bandorek giring di siyasetê de bû.

Di dema kin ya xebata xwe ya siyasî de, DTPê, baweriyek wisan da gelê Kurd li Bakûrê Kurdistanê ku dikare weke nûnerek ciyê baweriyê di civak û siyasetê de cîh bigre. Serketina ku partiyê di hilbijartina parlemanê û ya herêmî de bi dest xist, ev bawerî xurt kir ku Kurd bikarin bi riyên yasayî u bi xebata demokratîk ji rayedarên Turkiyê re nîşan bidin ka çi dixwazin û heya çi radeyekê ji çareseriya aştiyane re amade ne. Lê biryara Dadgeha Bilind, ev jî di demekê de ku gelê Kurd li benda pêngavên bi kiryare dewleta Turk di pêwendî li gel çareserkirina pirsa Kurd de bû, zerbeyek bi êş bû ku li pêvajoyê ket.
Ne tenê ji gelê Kurd re, belkû ji bo dewleta Turk jî hebûn u têkoşîna DTPê derfetek bû ku îradeya xwe ji bo çareserkirina pirsgirêka herî bingehîn a welat nîşan bide. Eger dewletê ev derfet bi kar bianiya, wê rê ji bo pêvajoyek nû veba ku di wê de têkoşîna gelê Kurd ji şeklê xwe yê kilasîk derkeve û bikeve ser rêbaz û kanalên demokratîk. Bi awayekê ku derfet dibû di çarçoveya sîstema siyasiye îroye Turkiyê de çareseriyek ji pirsa Kurd re mumkin bibe.

DTP weke rêxistinek ku di navbera du aliyên pir ji hev dûr de dikarî biaxive û weke pira çareseriyê kar bike, dikarî ji çareseriya pirsa Kurd re bibe alîkar. Lê derudorên ku ji aştî u çareseriyê hez nakin, derfet nedan ku ev partî misiyona xwe ya aştîxwazane bîne cî. Her çend rêxistinên DTPê ne ji bo û ne jî li dij çi aliyên şer helwest negirt û tenê ji bo anîne rojeva rastiya Kurd xebitî, lê aliyên şerxwaz hemû hewlên xwe dan ku DTPê weke baskê siyasiye PKKê bidin nasandin û ji ber wê yekê jî xebata partiyê bidin qedexe kirin.

Encamên daxistina DTPê li ser derfetên legale ku di destê Kurda de hebûn, astengiyek nû bû, lê wê nekare li pêşiya têkoşîna yasaiye gelê Kurd ji bo azadiya xwe bibe rêgir. Di heman demê de ev biryara Dadgeha Bilind a Turk, baweriya Gelê Kurd bi sedaqeta aliyê Turk ji bo bi hev re jiyana aştiyane ye gelan hin kêmtir kir. Pirs ev e ku gelo wê ji niha û pêve alîgirên xebata demokratîk û dilxwazên çareseriya aştiyaneye pirsa Kurd li Bakûrê Kurdistanê çawan, bikarin baweriya gel ji bo têkoşîna aştiyane di çarçoveya sîstemê de bi dest bixin.
Dewleta Turk dizane ku bi girtin û astengkirina têkoşîna partiyekê, nikare pêşiya armanc u daxwaziyên ku DTPê nûneriya wan dikir, bigre. Her weke çawan qedexe kirin û li peyre jî şerê li dijî tevgera Kurd di salên 80 de nekarî îradeya netewa Kurd ji bo azadiya xwe tev bişkêne. Îro DTP, sibê rêxistin an partiyek nû, gelê Kurd wê heta bi dest xistina mafên xwe yên neteweyî bi biryar têkoşîna xwe berdewam bike. Reng û şeklê têkoşînê dikarin bêne guhertin, an nav û nîşaneyên partiyan weke xwe nemînin, lê cewherê tevgerê wê bi awayek negor berdewam be. Ji ber ku cemawerê ku piştgiriya DTPê dikirin, wê ji niha û pêve jî heman rêbazê biparêzin û bi şeklek nû xebata xwe bidomînin.
Pêngava nû ya Dadgeha Bilind ya dewleta Turk bi tenê dikare bibe hegerê xurtbûna tund û tîjî u aloziyên pitir di navbera gelê Kurd û dewleta Turk de. Ev ne bi qazanca pêvajoya demokrasiyê ye, ne Turkiyê ji Yêkêtiya Ewrûpa nêzîk dike, û ne jî aştiyê û asûdeiyê tîne civaka Kurdistanê. Bi heman radeyê bi metirsî, girtina DTPê dikare pêşeroja jiyana bihevre ya du neteweyên Kurd û Turk di çarçoveya yek welatî de bi zehmetiyê re rû bi rû bike.

Xuya ye ku di navbera pêşengên bijardeye dewleta Turk û rastiyên welat de cudahiyek pir zêde heye. Mijara ku ji wan re giring, jesta yasayî u parastina wan pîvana ye ku bi sala ye gelê Kurd weke hevwelatiyên bê maf û rêza duyê bi zordarî paşde hêla ye. Biryara niha ya Dadgeha Bilind bi heman mebestê û di heman çarçoveyê de hatiye dan.

Ji bo gelê Kurd, astengiyên ku niha têne pêş, tê maneya hindê ku çirûska kêm hêz a roniya hêviyê ku ev demek bû xwe nîşan dida, dubare tarî dibe. Binav Pêngavên ku partiya Edalet û Pêşketin, AKPê, ji bo çareserkirina pirsa Kurd radikirin, derket ku tu bingeh nînin û tenê ji bo xapandinê bû. Ji ber ku girtina DTPê, nîşan da ku dewlet u partiyên deselatê bi hev re ji bo bêdeng kirina Kurdan dixebitin. Pêngava nû, dubare nîşan da ku sîstem li ser siyaseta înkar û tunekirina netewa Kurd û berdewamiya siyaseta bê îrade kirina gel, bi îsrar pêdagirî dike.
Nîşaneya wê sîgnala bi metirsî, şahî û lotikiyên alîgirên partiya nejadperest, MHP, piştî girtina DTPê bû. Devlet Bahçeliyê Serokê MHPê ku di hemû derfetan de didanên xwe li Kurdan disûrikîne, bi germî pêşwazî ji wê biryara ne di cî de kir u hê ji biryarê pitir çû pêş u banga bêdengkirina bi yekcariyê gelê Kurd kir. Di mitînga alîgirên partiya xwe de, Bahçelî, nerazîbûna xwe ji zimanê nerme Erdogan jî nîşan da û xwest ku tu derî bi ser Kurdan de venekin.
Ew nîşaneyên ne qenc, ne tenê ji bo gelê Kurd, belku ji hemû wan derudoran re ku bîr ji aştiya civakî li Turkiyê dikin, metirsî ye. Di serî de jî daxistina DTPê gavek ber bi paş ve bû ku wê Turkiyê û pêvajoya aştiya civakî di welat de bi astengiyên cidî re rû bi rû bike. Ji ber ku DTP tenê rêxistinek bû ku weke muxatebek rengeyî ji bo wan aliyên ku dixwestin ji riyên çareseriyê bigerin, dikarî bê meydanê. Lê Turkiyê ji bo demek nediyar ev derfet ji destê xwe derxist.
Aqilê selîm her tim wê dixwaze ku ji bo pêşî girtin ji tund û tîjiyê derfeta siyaseta yasayî bi ser rexnegiriên siyaseta dewletê de vebe. Gelê Kurd ku di hemû dîroka Turkiyê de weke aliyê bê maf û bindest hatiye temaşe kirin, îro di serî de bi riyên legal, lê bi hemû derfetên ku bi dest bixe, ji bo azadiya xwe kar dike. Vekirina rê ji bo tev lê bûna demokratîk, tenê destebera bi dawîanîna tund û tîjî û demokratîzekirina welat e.

www.serxwebun.org

Kuştina Kasibkaran,

Cinayetek Sîstimatîk Û Pîlanek Veşartî

Nûredîn Sofîzade

Çend rojan berî niha li 15'ê Sermaewzê de, hêzên xwînmij ên Rejîma Komara Îslamî li herêma "Soma"a girêdayî bajarê Urmiyê, cinayetekî hovane afirandin ku vijdana mirovahiyê dihejîne.

Ew jî, eva bû ku li kûrahiya herêma Somayê û aliyê kêm 20km dûrî sînor, 3 ciwanên kasibkar di nava tirumbêlên xwe da ketne ber destrêjiya çekdarên rejîmê û hatine kuştin. Cinayetkarên rejîmê bona vê ku qasê vê cinayetê mezintir û hovanetir nîşan bidin, agir berdane termê wan kasibkaran û tirumbîlên wan.

Belê 3 ciwanên kurd ku bona dabînkirina bijîwa malbatên xwe kasibkarî dikirin, bûne goriyê destê cinayet û tawana Komara Îslamî. Canê Bengîn, Pizişk û Girmanê bê guneh, hovane ji wan cinayetek ku tenê ji destê dîktator û Hîtlerê serdem, anku Komara Îslamî a Îranê tê.

Li rastî de ev cinayeta ne tiştekî nû ye û ne jî ya dawî dibe, bêşik heya Komara Îslamî li ser kar be, rewşa xelkê welatê me û bi taybetî Kurdistanê ji vê yekê baştir nabe. Ya ku di vê navberê de hewceyî baldanê ye, pîlana veşartî a Komara Îslamî li Kurdistanê de ye ku bi kurtî emê îşarê pê bikin.

* Gelê kurd bi dirêjahiya dîrokê xebat

bona rizgarî û bi destveanîna maf û azadiyên netewî yên xwe kiriye. Bi taybetî eva serê 30 sala ye bê rawestan bi dijî Komara Îslamî xebatê dike û qet neçûye bin barê daxwaziyên rejîmê. Lewra vê rejîmê her Ji yekem rojên bidestgirtina desthilatê bi hemû hêz û şiyana xwe dujminatiya vê netewa mafxwaz û azadîxwaz kir û bi şêweyekî sîstimatîk li cehda asmîle û tepeseriya gelê kurd da bûye, û heta li encama fitwaya Xumênî de can, mal û namûsa kurdan bi helal hatiye zanîn û heta niha jî ew fitwa nehatiye hilweşandin û emegdarên Xumêynî û Weliyê Feqîh wê fitwayê bi terzên cur bi cur birêve dibin. Bêguman kuştina kasibkar û ciwanên kurd jî nikare dûr be ji vê fikarê û dujminatiya bi netewa kurd e.

* Niha ku bi hemû terzeke rejîm li sernixûniyê nêzîk bûye û li her demekê pitir dengê nerazîbûnan li welat da bilind bûye û gelê kurd jî pitir ji her neteweyekê li xebata azadîxwaziyê da ektîv û çalaktir e, lewra rejîm bi wan karane dixwaze ciwanên kurd çawtirsandî û wisan tê bigehîne ku ger rojekê nerazîbûn û serhildanek hebe, dê destê wan bona kuştin û tepeserkirina kurdan de vekirîtir be û xwe jî li hember tu kes û aliyekê de berpirsiyar û bersîvder nabîne. Lê di rastide de rejîm bi vê yekê li nav xeyalan de dijît, çimkû hekî girtin û kuştinê bikarîbaya ciwanên Kurd çavtirsandî bike, divêt niha gelê me bêdeng û bê helwest bibûya!!

* Herwekî li jor îşare pê hate kirin, rejîm xwe li ser lêva kendalê gor û nemanê dibîne û ji aliyê din jî êdî sebr û tehemula xelkê lihember rejîmê de lêvrêj bûye. Lewre li rojên dawîn yê temenê xwe da, dixwaze carekî din bi destê zorê an jî bi dana pare û hindek çûr û îmtiyazên kêm û erzan, xelkê çekdar bike û raikşîne aliyê xwe. Bi vê yekê jî him kurdan bi destê kurdan dikuje, him jî dara nifaq, şer û tolhildanê li nava kurdan de diçîne, lewra cinayetên bi vî awayî hovane li Kurdistanê da encam dide.

Ji hêla din ve jî dixwaze pêşiya kasibiya xelkê bigre daku hewcedar bin û qesta nanê îxanetê bikin û çeka bêşerefiya rejîmê wergirin hilgirtin. Lê divêt rejîm bizane ku gelê me gellek hişyartir ji vê hindê ye ku bi nanê îxanetê bijîn û xizmetê bi desthilata hov û dijî mirovî a Komara Îslamî bikin.

Armancek din ya rejîmê jî ev e ku dixwaze deverê ne ewle nîşan bide û bi pêkanîna aloziyan, malbat û eşîran ji hev dûr bixe. Herweha şik û guman û bêhitbariyê di nav xelkê da çê bike daku xelk bona xweparastina li hemberî hevdu çekên rejîmê werbigrin. Ji aliyê din ve jî bi şewitandina termê kesên kuştî, tirs û xofê bixîne deverê.

Bi giştî tê çawnihêrîkirin ku rejîm û xulamokên xwe, pîlanêt curbicur di dest de hene, lewra gelê me bi hemû cudahiyên xwe ve, divêt serbarê hişyarbûn ji pilanên rejîma mirovkuj, herwiha li hemberî cinayetên rejîmê de jî yekdeng û xwedîhelwest bin, û nabe bi tu nirx û buhayekê bikevne nava dafik û tora raçandî a dujmin. Herwiha cehdê jî bikin ku hemû pîlanên Komara Îslamî bikne bilqên ser avê û pûç bikin.

agirî

Pîrozbahî

26'ê Sermawezê, Roja Pêşmergên Kurdistanê ye. Ger em qehremanetî, Cangorîtî û destarêsiyên Pêşmerge bikin Pîvan, divêt hemû rojên salê weke roja Pêşmerge bihên diyarîkirin. Lê bingeha diyarîkirina vê rojê ji aliyê PDK Îranê ve vedigere ser girtina dawîn binkeya leşkirî ya Sîstema Paşatî li sala 1945'an de.

Di vê boneya Pîroz de, em Pîrozbahiyê ji hemû xelkê Kurdistanê, malbatên Şehîdan, Girtiyên Siyasî û Pêşmergên Kurdistanê, bi taybet ji Pêşmergên PDKÎ dikin.

Desteya Weşana Agirî

Taybet Bi Boneya 26 Sermawezê, Roja Pêşmergên Kurdistanê **Hejmar: 125**

Peyama Deftera Siyasî Ya PDKÎ Bi Boneya 26'ê Sermawezê

Hevwelatiyên rêzdar!
Xelkê xebatkar yên Kurdistanê!

Pêşmergeyên qehreman û çavnetirs yên Kurdistanê!

Beşdarên rêzdar di rêûresma 26'ê Sermawezê, Roja Pêşmergên Kurdistanê!

Ji aliyê Deftera Siyasî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê ve, bi boneya 26'ê Sermawezê, 25'emîn salvegera binavkirina Roja Pêşmergên Kurdistanê, pîrozbahiyên germ ên xwe pêşkêşî hemû xelkê nîştimanperwer yên Kurdistanê, Pêşmergeyên Kurdistanê bi giştî û pêşmerge, endam û alîgirên PDKÎ bi taybetî dikim.

26'ê Sermawezê roja pêşmerge û rêz û hurmetgirtin ji pêşmergeyên Kurdistanê ye Ew xebatkarên ku bi bîr û hizrên pêşkevtinxwazane yên xwe bo bidestxistina mafên neteweyî yên gelê Kurd heyî û jiyana xwe gorî kirine û amade ne ku di pêxema azadiyê de canê xwe jî gorî bikin. Peyva bi heybet û pîroz a pêşmerge kalayeke kêrî bejin û bala çekdarê bi bîr û bawer yê Kurd, navekî hêjayî wî û guncaw li gel fidakarî û cangoritiyên pêşmerge, weke pêşeng û pêşrewê gel û cihgirtî di çepera herî pêşa xebatê de.

Hevalên rêzdar!

Roja 26'ê Sermawezê, roja hemû ew kesane ye ku dilsozane li ser bingeha seha gelhebînî, niyetpakî û welatparêziyê çeka berevaniyê li milê xwe kirine û di rêya bextewerî û serfiraziya gelê xwe de li tu fidakariyekê xemsariyê nakin. Li hemberî dujmin de weke agir û borkan, tevî hevalan jî rûxweş, hêdî û hêmin.

Pêşmerge ev mome ye ku di tarîtiya şevezenga dîktatoriyê de diteyîse, di pêxema ronahiya gelê xwe de dişevite, bo gel ji dayîk bûye, di pêxema vê armancê de jî ku rizgariya gelê Kurd e, tekoşînê dike. wekî Dr. Seîdê nemir bi boneya Şehîd bûna Dr. Qasimlo gotiye: "Di pêxema wî gelî de yan dê serkewin yan jî dê ser dabinên". Di vê rojê de civatên xelkê Kurdistanê emegnasane hemû salê di gund û bajarên Kurditanê de bi awayên cur bi cur rêz ji pêşmerge digirin û aheng û cejn û şahiyan lidar dixin. Serî ji malbatên serbilind yên şehîdan û malbatên xweragir yên pêşmergeyan didin û tevî wan peymana wefadariyê nû dikin. Em dikarin bêjin ku 26'ê Sermawezê, nûkirina peymana wefadariyê bo domandina xebatê, heya gihîştin bi armanca gelê kurd e.

Hevwelatiyên rêzdar!

Di roja pêşmergeyên Kurdistanê de em pîrozbahiyê ji tev xelkê Kurdistanê dikin ku newestane di hemû rewş û zirûfan de tevî pêşmerge û piştî penahê pêşmerge bûne. Hekî bo diyarîkirina roja pêşmerge yek ji bûyerên destanrêse hêza pêşmerge bikin pîvan û hawriyekê ji xebat, berxwedan, fîdakarî û xwegorîkirina şev û roj a pêşmerge bidin, diviya hemû rojekê, weke roja pêşmerge binav bikin: Lê em di 26'ê Sermawezê de, weke rojekî sembolîk rêz ji pêşmerge û taybetmendiyên wê/î digrin û eva jî girîngîdan e bo mezinahiya van mirovên rizgarîxwaz. Lewma PDKÎ di Pilînoma 2'êmîn a xwe, di rojên 15'ê heya 24'ê Gelawêja sala 1363'ê a Rojî de, bi biryarekî şoreşvanî û berpirsane, 26'ê Sermawezê weke roja pêşmergê Kurdistanê diyarî kir. Rojek ku di sala 1324'ê de bajêrvaniya Mihabadê ji aliyê şoroşvanên kurd ve hate çekkirin û dawîn paşmayên dezgeha Polîsî û fesada nîzama paşatî di wî bajarî de hate jinavbirin.

Piştîwê Sipaha Milî, weke yekemîn destkevta serhildana xelkê hate avakirin. Bi wî awayî jî yek ji hêviyên mêjdemî yên gelê kurd bicî hat Di vê demê were heya niha, xebatkar û şoreşvanên kurd bi Pêşmerge hatine binav û deng kirin û heya niha jî di kom û civatên navneteweyî de weke parêzerê mafê mirov tên hesibandin.

Hogirên roja Pêşmergê

Kurdistanê!

Niha jî 64 sal bi ser vê bûyera dîrokî de derbas dibe, herçiqas Pêşmerge tevî du nizamên dîktator yên paşayetî û Komara Îslamîya Îranê berxwedanek berdewam û bixwîn bi xwe dîtiye, lê weke remz û sembola rizgarîker a gelên Îran û Kurdistanê, çepera xwe qahîm ragirtiye, bi awayekê ku ev xebata tenê di herêmên Kurdistanê de û di tekoşîna çekdarî de nehatiye berteng kirin, belkî hatiye veguhastin bo nava kom û civakên ronakbîrî, zanîngehî, nawendên dîplomasî û li ser maseyên aştî û aştîparêzî û mafên mirovan de akincî bûye Di civînên navneteweyî de weke dîplomatekî jêhatî, hebûna xwe di nava raya giştî de dide selimandin. Li Îraqê pêşmerge bû bi Serok Komarê welatekî Federal, herwisa pêşmerge bû bi Serokê parek ji Kurdistana azad kirî.

Di vê boneya pîroz de, hewce ye ku nirxandinek herçiqas kurt jî be, di pêwendî tevî asta mirovheziya pêşmerge û rewşa nebaş ya Komara Îslamî û dam û dezgehên vê rejimê bikin.

Ger em mêzeyî 30 sal temenê berxwedan û tekoşîna Hêza Pêşmerge li hemberî Hikûmeta şûm û reş ya Komara Îslamî bikin û bi rewşa jiyana gelên Îranê li hundur de bidne berhev. Hejarî, nebûnî, xurtbûna madeyên hişber, tirsandin, darvekirin, zîndan, îşkence, destdirêjiyên cinsî, ferq û cudahîyên Olî, regezî û cinsî, dizî û sedan diyardeyên din yên bi vî awayî, diyardeyên, neşaristanî û dûr ji her terze destkevtekî pêşkevtinxwazane ne, ku di rejîma Komara Îslamî de tên

www.archivekurd.org

xuya kirin.

Herwisan bi avakirina saziyek nîzamî û terorîstî a weke Sipaha Pasdaran, armanca Pawanxwazî û dirêjkirina temenê desthilata dîktatorî û dijî mirovî a xwe dişopîne û bi zêdekirina desthilata vê saziya terorîstî di warê malî û nîzamî û locîstîkî, li piraktîk de deshilata Îranê kete dest vê Saziya tepeserkar .

Di pêwendî tevî cîhana dereve de teror, destêwerdan di kar û barên welatên cîran , hinartina madeyên bêhişker, rêberîkirina terorîzmê, xebat bo gihîştin bi Çekên Navikî, danana bomban li cihên giştî, hinartina çek û hewcehiyên nîzamî bo saziyên terorîstî û... ev kiryar in ku Komara Îslamî adet pê kiriye û pêre mijûl e.

Binpêkirina mafên mirovan, birêvenebirina zagonên navneteweyî, rehîn girtin û dehan bûyerên din ku tevî yasaya civakên pêşketî yên navneteweyî de hev nagrin, bûne hegera vê çendê ku dîroka pêşketinxwazên Îranê di nava kom û civaka cîhanî de, kesatî û şaristaniyeta Îraniyan li berçavên raya giştî eybdar be. Niha Komara Îslamî a Îranê li derveyî welat bi tenê maye goşegîr bûye û di hundirê welat de jî, man û dewama wê ketiye bin pirsiyarê. Lê di heyama 30 salên borî de ger em balê bidin rewşa Pêşmerge, Hêza Pêşmerge serbarê hemû arîşe û astengan, di warê navxweyî de li Îranê bi giştî û li Kurdistanê bi taybetî, ne tenê weke piştevaneke bihêz ji bo bizava rizgarîxwaziyê tê hesibandin, belkî cihê hêviya hemû gelên Îranê ye û bi şanazî ve weke hêza rizgarkerê gelê Îranê jî tê mêzekirin ku li hember dîktatorî û zordariyê de bi awayekî micid berxwe dide. Di civaka navneteweyî de jî pêşmerge tenê weke hêzeke çekdar nahê nasîn, belkî weke miroveke/î azadîxwaz û alîgirê

aştî, azadî û mafê mirovan tê naskirin. Niha Pêşmerge dîplomat e û bi cilûbergên pêşmergatiyê di nav welat û civatên navneteweyî de daxwazên xwe tîne berbas. Ew serdem derbas bû ku tenê weke çekdarê şoreşger yê qada nizamî bihê naskirin û tenê çiyayên Kurdistanê piştevanê hêza pêşmerge bin. Kiryar, riftar û armancên rewa ên Hêza Pêşmerge weke xwedîkekê Pêşmerge didin nasandin. Hêza Pêşmerge di xebata neteweyî a gelê Kurd de xwediyê roleke girîng û pêşeng e, pêşmerge di pêxema aştî, azadî, demokrasî û mafên gelan de, ji tu fîdakariyekê xwe dûr nexistiye.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê divêt şanaziyê bi xwe bike ku dahênerê navekê bûye ku bûye remza fîdakarî bo gelê Kurd li hemû parçeyên Kurdistanê. Bi xweşî ve perçeyeke Kurdistanê gihîşte heya qasekê mafên xwe, lê heya niha jî li Îranê piştî 30 salan, gelên Îranê di vê çeperê de xebata xwe, li dijî Komara Îslamî a Îranê, ji bo nehêlana wê sîstemê didomîn in. Bo gelê Kurd û Pêşmerge, cihê serbilindiyê ye ku ji 30 salan berî niha ve heya niha, di destpêka desthilatdariya Komara Îslamî de, ew netewe û hêza pêşmergeyên Kurdistanê bi rêberiya PDKÎ, li dijî serkut û tepeserkirina gelên Îranê sekinî ye û serbarê ew hemû serkutan, berdewam xebata xwe didomîn in.

Niha helwest û pîlanên dijîgelî ên Komara Îslamî a Îranê bo xelkê Îranê eşkere bûne, ji ber vê yekê jî rejîmê pêgeheke wilo di nav gelên Îranê de jêre nemaye. Xwenîşandanên îsal, îdama lawan, zîndan û îşkencekirin, daxistina kovar û rojnameyan, fakterên sereke ên dijîgelîbûna Komara Îslamî a Îranê ne û nîşanderê wê rastiyê ne ku temenê rejîmê ber bi kutabûnê diçe. Serhildan û nerazîbûnên li dijî sîstema Komara Îslamî a Îranê qonaxeke nû ye ji bo guherandin û têkşikandina vê sîstemê. Arasteya wê serhildanê ber bi nizameke Demokratîk û Federal e ku hemû gelên Îranê û tex û qatên welat, di wê nizamê de digihîjin xwestek û daxwazên xwe û serkevtin bi ser kevneşopiyê misoger be.

Di vê roja pîroz de, carek din em destên newestiyayî yên Pêşmerge, xortê emegdar yê gel, digivişînin. Em hêviya serkevtin bi ser sîstema cehl û tarîtiyê de bo Pêşmerge dixwazin û hêvîdar in ku Pêşmerge her xweştiviyê xelkê û mizgînîderê azadiyê be û xelk jî heya serketinê, Piştevanê pêşmerge bi mînin.

Bijî Pêşmerge, xortê newestiyayî û têkoşerê gelê Kurd.

Silav li malbatên serbilind ên şehîdan, ew xortên ku bi xwîna xwe, heqaniyeta daxwazên gelê xwe nîşan dan û domandina xebatê ji bo me bicî hiştin.

Silav li Girtiyên Siyasî ku Pêşmergeyên newestiyayî ên nav zîndanên rejîma Îslamî a Îranê ne.

Silav li xelkê xweragir ên Kurdistanê ku di hemû rewşan de piştevanê Pêşmerge bûne.

Serkeve bizava rizgarîxwaziya neteweyî a gelê Kurd bi rêberiya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê.

Bihiloşe rejîma kevneşop û dijîgelî a Komara Îslamî a Îranê.

www.pdki.org

Di Nawenda Sê Ya Kurdistanê De Cejna 26'ê Sermawezê hat lidarxistin

Roja 27'ê Sermawezê (18ê Kanûna 2009)'an, bi hikevta 26ê Sermawezê roja Pêşmergê Kurdistanê, rê û resmek di nawenda Sê Kurdistanê de hat lidarxistin.

Nûçegihaniya Kurdistanê di vê derbarê de ragihan, ew cejne bi Sirûda Netewî ya "Ey Reqîb" û deqîqeyek bêdengî ji bo rêzgirtin ji canê paqij yê şahîdên rêya rizgariya Kurdistanê dest pêkir û peyama nawenda Sê ya Kurdistanê ji aliyê Rehîm Mengurî, endamê Cihgirê Komîteya Navendî ya PDKÎ ve hat pêşkêşkirin. Mengurî di beşek axaftina xwe de amaje bi rol û xebata Pêşmerge, û Pêşmergên Kurdistanê wek sembula xweragrî û berxwedana gelê kurd li hember dujminên netewa Kurd de kir, û herwiha Roja 26ê Sermawezê weke rojeke girîng û dîrokî di tevgera rizgarîxwaziya netewa Kurd de hesiband.

Piştre Sirûda "Em Pêşmerge ne" ji aliyê koma muzîka PDKÎ ve hat pêşkêşkirin.

paşan, nawenda Sê ya kurdistanê, di kiryarekî sembulîk de, bi hilkevta Roja Pêşmerge 65 pêşmergên kevnare PDKÎ ku temenê pêşmergatiya wan pitir ji 20 salan bû, hatin xelat kirin.

Hêjayî gotinê ye dawî ya wê cejnê, bi şahî û govenda beşdaran dawî hat.

Cejna 26'ê Sermawezê Di Binkeya Polîtbîroya PDKÎ De Hat Pîrozkirin

Cejna 26ê Sermawezê (17ê Kanûna 2009)an, Roja Pêşmergê Kurdistanê bi beşadriya endamên rêberî yên PDKÎ û herwiha kadro û Pêşmerge, malbatên Pêşmergan û mêvanan, bi sirûda neteweyî ya "Ey Reqîb" û deqîqeyek bêdengî bo rêzgirtin ji canê paqij yê şehîdên rêya rizgariya Kurdistan dest pê kir.

Peyama Polîtbîroya PDKÎ ji aliyê Kawe Behramî, Endamê Deftera Siyasî yê Partiyê ve hat pêşkêşkirin.

Kawe Behramî di peyama xwe de, li ser pîroziya wê rojê û kesatiya bilind a pêşmerge axifî û da zanîn: 26'ê Sermawezê, Roja Pêşmergê Kurdistan û rêzgirtin ji Pêşmergê Kurdistanê ye. Ew têkoşerên ku bi bîr û hizrên pêşkevtinxwazane ên xwe bo destve anîna mafên neteweyî ên gelê Kurd, mal û jiyana xwe gorî kirine û amade ne di pêxema azadiyê de canê xwe jî gorî bikin.

Peyva bilind û pîroza Pêşmerge, kinceke tijî bi bejin û bala çekdareke bi bîr û bawer e Kurd e, navekî bi birûmet û jêhatî digel fîdakarî û canbaziya pêşmerge ye, weke pêşeng û pêşrewê gel û cihgirtî di çeper herî pêş a xebatê de ye.

Piştre peyama Yekîtiya Jinên Demokrat ên Kurdistana Îranê ji aliyê Hêro Celdiyanî, Sekerterê Gitşî yê wê Yekîtiyê ve hat pêşkêşkirin.

Di beşekî din a vê rêûresmê de, îsal jî wek salên berê, du pêşmerge ku 20 sal bi ser temenê pêşmergatiya wan de derbaz bibû, ji aliyê Komîsyona Siyasî- Nîzamî ya PDKÎ ve hatin xelat kirin.

Piştre peyama Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê ji aliyê Dara Natiq, Sekereterê Gştî yê wê Yeketiyê ve hat pêşkêşkirin.

Dûre peyama Yekîtiya Xwendekarên Demokrat ên Kurdistana Îranê ji aliyê Nasir Salihî Esil, Sekreterê Gştî yê wê Yekîtiyê ve hat pêşkêşkirin.

Di beşeke din ji vî rêûresmê de, Komîsyona Amûziş û Hînkirina PDKÎ, bi hilkevta 26ê Sermawezê Roja Pêşmergê Kurdistanê, çend pêşbirkeyê Werzişî rêve biribûn ku di wê rêûresmê de xelat bi ser serkevtiyan de hatin dabeşkirin.

Tê zanîn di vê rêûresmê de çend sirûd, helbest û pexşan hatin pêşkêşkirin.

Hêjayî gotinê ye çend peyamek bo wê rêûresmê hatibûn ku ji aliyê rêveberên rêûresmê ve hatin xwendin. Dawiya wê rêûresmê bi şahî û govenda reşbelek a keç û xortên demokrat bi dawî pê hat.

www.arsivakurd.org

Stêrkên Geş Yên Esmanê Pêşmergatiyê

N: Baran



Çar Stêrkên geş yên asîmanê azadîxwaziyê, Çar azadîxwazên çepera Demokrasiyê, Çar demokrasîxwazên Pêşmerge û Çar Pêşmergên kela berxwedanê, bûn bi remzek din ya Gelawêjê û nimûneyek din ya canfidayî, çelengî newestiyana hêza biheybet ya Pêşmerge û asîmanê bêdawî yê hêvîxwaz û armancxwaziya Pêşmerge ronî kirin. Her 4 şehîd: Husên Muhemedî, Yûsif Feqîhî, Azad Berayî û Seyfula Dunyayî, roja 30'ê Gelawêja îsal piştî du rojan şerê qehremanane tevî hêza zor û bor û pirçek a Rejîma Komara Îslamî li devera Feyzulabegî a Seqizê, tevlî karwanê şehîdên sorxelat yên hizb û gel bûn.

Şehîd Husên Muhemedî, sala 1353'ê Rojî, li gundê Çomelû a devera Feyzulabegî a Seqizê ji dayîk bûye. Dema ku li sala 1377'ê Rojî de tevlî refa pêşmergên PDK Îranê bû û şanaziya liberkirina kincên pêşmergatiyê jê hat bexşîn, radeya xwendewariya wî, 5 a destpêkî bû. Lê li qutabxaneya demokratê de hînî waneya azadîxwazî û demokrasîxwaziyê bû. Hez û viyana wî bo hînbûnê bi qasekê bû ku tu demekê li pirsiyarkirin s dûreçûna ser meseleyên têkildar bi hizb û gel mandî nedibû. Hevdem jî him pêşveçûn û him jî kêmasî didîtin û netenê xemsarî li rûyê wî de nedihat dîtin, jiberku berdewam rûhiye bi hevalên xwe dida û lêvrêj bû ji manaya jiyan û xebatê. Reformxwazî bal şehîd Husên, xwastek nebû ku tenê pêwendî bi sîstema Siyasî û Civakî hebe, belkî guhertinxwazî bal şehîd Husên, takê xwe weke pêşmerge jî, vedigirt. Mirovek bû ku berdewam riftar û livînên xwe wekî pêşmergeyekê dinirxand, him jî daxwaz ji hevalan dikir ku raya xwe derheq riftar û rabûn û runiştinên wî bînin ziman. Bi wateyek din pirsiyar ji xwe û hevalan bi merema guhertin û pêşdeçûnê li hemû biyavan de dikir. Li warê sporê de, tim beşdar dibû, ne ji ber destveanîna pileyek jortir, belkî tim digot ku ez îradeya xwe dinirxînim û li ser vê baweriyê bû kesek ku îradeya wî lawaz û jar be, nikare îrade û hêzê bide xelkê. Şehîd Husên Muhemedî hawar û gaziya nifşek maf zewtkirî bû.

Şehîd Yûsif Feqîhî, sala 1354'ê Rojî, li malbatek hejar û deskurt ya bajarê Seqizê hate dinê û ji ber rewş û kawdana jiyan û guzerana malabata xwe, tenê karî heya pola 2 ya Nawendî bixwîne. Li jiyê 24 saliyê de qonaxek nû û pir ji şanazî û deskevt destpê dike. Anku vî temenî de dibe ku tevlî refên PDK Îranê dibe û bi liberkirina kicên pîroz yên pêşmergatiyê, dibe bi hebînk û hejêkiriyê hemû hevalên Pêşmerge. Dibîte nimûneyê pêşmergeyekî biexlaq, bi dîsîplîn, pirrkar, mandînenas û mamosta. Şehîd Yûsif Feqîhî li midehê yek dehsal pêşmergatiyê de, li behre û îstiidada hînbûn û paşan jî hîndekariyê de, evqas zû çilû da ku wekî berjeng û nimûneyê pêşmergeyê herî baş, nav û deng peyda kir. Xwe pêgihand û bi mandîbûn û vîna fêrbûna zimanê Îngilîzî, bû bi şehrezayê zimanê Îngilîzî û momaostayê Îngilîzî. Herweha bû bi hevkarê rojnameya 'Kurdistan'ê û birêvebirê kuncê "Rojev" li vê rojnameyê de. Bû bi nivîskarê "Hînbûna Zimanê Îngilîzî" û wergerê çend pirtûkên bi navûdeng. Bû bi pêşkêşvanê programa "Rave" li Tîşk Tv de. Herwiha li dawîn sala temenê tejî berhem û şanazî yê xwe de jî mijûlê hînbûna zimanê Îspanyolî bû û heya qasekê jî têde biserketibû. Em dikarin bibêjin ku şehîd Yûsif bi başî di xizmetkirina bi gelê xwe de, heta yek dem jî xisar nekir û ligel tevlîbûna bi karwanê şehîdan, bû bi sembol û remzek nemir bo hemû hevalên pêşmerge.

Şehîd Azad Berayî, sala 1355'ê Rojî li bajarê Seqizê ji dayîk bûye, sala 1380'ê pêwendiyê bi rêxistina PDK Îranê li hundur de digre. Mezintirîn hêviya wî, pêşmergebûn bû, lewre cehd û xebat çi berî tevlîbûna bi refên Partiyê li sala 1383'ê de, çi jî li dema pêşmergatiyê de selmandina rastiyekê bû bi navê hewcehiya tekoşîn li pêxem pêşmergatiyê de. Şehîd Azad pêşmergebûna xwe tenê bi fermîwergirtina xwe li refên pêşmergan de, nedidît. Belkî berdewam hewil dida bi xwepêgihandin û birêvebirina her karek hizbî ku ji destê wî bihatiba, bibe bi peşmergeyek fîdakartir, çalaktir, xebatkartir, bawerpêkirîtir û dilsojtir. Şehîd Azad mirovekî sade, xakî û xelkî bû û berdewam li hizra xelkê Kurdistanê de bû, hizir ji wê rojê dikir ku bi kincên pêşmergatiyê li nav xelkê xwe de berbirûyê Rejîma Paremayî a Komara Îslamî bibe. Şehîd Azad, dunyayek bû ji îman û bawerî bi Partiya xwe û cangorîtî li pêxema gelê xwe û ektîvbûn bi merema xizmetên zêde û zêdetir.

Şehîd Seyfula Dunyayî, li temenek kurt de, destanrêsek ji hemase û fîdakariyan li rûpelên dîrokê de nexşand ku li her demek li jiyê wî de, xolqandina stêrkek hêviyê hebû. Sala 1367'ê li gundê Qeregula devera Feyzulabegî a Seqizê ji dayîk bûye, xwendina xwe heya pola yekem a paşnawendiyê domandibû. Li 18 saliya xwe de hatiye nav refên pêşmergên Kurdistanê. Li gel tevlîbûna bi refên PDK Îranê, li serxweyî, bîrtîjî û riftarên şoreşvanî û nêrînên bihêvî û xebatkarane yên wî dibine xwedîka nîşanderê bejna bilind û pir ji heybeta pêşmerge ku bala hemû hevalan radikişand. Şehîd Seyfula, bal hevalên xwe, wiha hatibû naskirin ku li dema jêhelçûn bo ser ewraz û çiyayan de, vîn û îradeya wî bi sanahî li ser bilindahiyê de zal dibû. Bi aramî û liserxwebûnek tewaw ve, helwesta polayîn a xwe nîşan dida û bi çavek aram û ehûrayî mêzeyî asoyê dikir. Şehîd Seyfula Werzişkar, bi disîplîn, evîndarê xwendin û hînbûnê û dilhebînkê xelkê deverê bû, bi awayekê ku wekî mirovekî hezjêkirî binav û deng bibû.

Li roja pêşmergên Kurdistanê de, em van şehîdan û hemû şehîdên rêya azadî û misogerbûna mafên netewî, bixêr bibîr tînin û waneya çawa pêşmergebûn û cangorîtiyê ji wan fêr dibin.

***

www.pukmedia.org

Xwenîşandana "Hewzeyên Îlmiye" Bi Çi Armancekê?

Zaniyar

Roja Şemî, 21'ê Sermawezê, mela û feqiyên "Hewzeyên Îlmiye" yên bajarê Qum, Meşhed û çend bajarên din, bi tûjkirin û fermana rêberên rejîmê, xwenîşandanek lidarxistin û dijkiryara xwe li hemberî dirrandina wêneyê Xomênî li bizavên nerazîbûnên 16'ê Sermawezê de nîşandan.

Rejîmê bi lidarxistina wê bizavê çend armanc dişopandin ku emê li jêr de îşare bi wan bikin.

Yekem li bilawkirina nûçeyê van xwenîşandanan de, kanala "Xeber"a rejîmê ji zarê wan Ayetulayan ve digotin ku dijberê Xamineyî ne û didan zanîn ku wan gotiye ne tenê em dijî Xamineyî nînin, belkî em xwe bi serbazên rêber dizanin û naveroka Îrana Îslamî jî bêy Weliyê Feqîh betal dihesibînin, û bi vî awayî jî peyrewên wan Ayetulayan bi emirberî ji Xamineyî han bidin.

Duyem, rejîmê xwast ji vê rêyê ve hesta ayînî ya wan bibizivîne û bêje ku li nerazîbûnên dijî rejîmê de sivikatî û bêhurmetî bi ayînê û rêberê Komara Îslamî "Xomênî" tê kirin. Herwiha bibêje ku neraziyan hemû hêlên sor bezandine(derbas kirine) û bi vê hêcetê jî pêvajoya girtin û sepandina cezayan, xurttir û berfirehtir bike.

Sêyem, bi pêkîner û beşdarên bizavên nerazîbûnê re bibêjin ku ger ew cure kiryarane ducarkî bibin, xêncî Hikûmet û dezgehên tepeserkar yên wê, dê tevî xelkê bisilman yên Îranê jî berbirû bibin. Bi vî awayî jî valahî û şeqarê bixe nav refên yekgirtiyane yên nerazî û xwenîşanderên dijî desthilata Komara Îslamî.

Diyare ev pîlana rejîma Komara Îslamî jî li demekê de hat darêtin ku li xwenîşandanan de dirûşmên li dijî rejîmê, Xamineyî jî digrin. Li vê çarçoveyê de jî, dengê nerazîbûnê ji tu Ayetula û nawendek ayînî û mesebî bilind nebû, ku eva jî zengek metirsîdar bû bo Xamineyî.

Lewre ji vê rêyê ve hewil hat dayîn ku carek din hitbar û baweriya nawendên ayînî û mesebî bi Xamineyî raxin berçawê xelkê. Herwiha li rex vê yekê de jî bixebitin ku nerazîbûnên li dijî rejîmê, bi îhanet û bêhurmetî bi ayîn û bawerên Îslamî yên xelkê bişibînin û li çeka jengî bi dijî neraziyan mifahê bistînin. Li rastî de jî li dawîn penageha dijberiya bi xelkê nerazî de, çeperê bigrin.

Daxuyaniya Komîsyona Ragehandina PDKÎ,

Derheq Koça Dawiya Ayetula Muntezirî

Şeva Şemî, 28'ê Sermaweza 1388'ê Rojî (19.12.2009'an), Ayetula Husên Elî Muntezirî, yek ji merciên Şîeyên Îranê li temenê 87 saliyê de koça dawiyê kir. Muntezirî berî Şoreşa Gelên Îranê li sala 1357'ê Rojî de, yek ji dijberên Rejîma Mihemed Riza Şa û ji nêzîkên Xumênî bû û ji ber xebata siyasî ya xwe çend caran hatibû zîndanîkirin. Li midehê dûrxistina Xumênî bo Necefê, navhatî nûnerê Xumênî bû. Piştî Serketina Şoreşa sala 1357'ê, Muntezirî wek yek ji avakerên Komara Îslamî bû bi Serokê Meclîsa Xubregan a Yasaya Bingehîn. Sala 1364'ê de bû Serokê Meclîsa Xubregan a Rêberiyê. Herweha dema ku Xumênî hêj li jiyanê de bû, wekî Cîgirê rêberê Komara Îslamî hat diyarîkirin. Lê li Havîna Sala 1367'ê de ji aliyê Xomênî ve ji cîgiriyê hat xistin. Muntezirî piştî mirina Xumênî ji ber rexnegirtin ji siyaset û kiryarên Komara Îslamî li mala xwe de hat destbiser kirin û hemû nawendên Hizrî û Ayînî yên girêdayî bi wî jî hatin daxistin û ew rewş bo midehê 21 salan dom kir. Lê jiber vê ku Muntezirî bi sedema nerazîbûn ji rejîmê û rexnegirtin ji siyaset û kiryarên wê hemû berpirsatî û îmtiyazek jidest dabû, berdewam bû ji rexnegirtin û dijberiya rêberên rejîmê û wekî dijberê Xamineyî û karbidestên payebilind yên rejîmê dihat dîtin.

Muntezirî her çiqas ku ji avakerên rejîmê bû û li çarçoveya Komara Îslamî de difikirî, lê xwedî hestek taybetî bû ku ew ji Xamineyî û rêberên din yên rejîmê cuda dikir, bi taybet ku li dijî riftarên tepeserkarane yên rejîmê û îdamên berfireh yên girtiyan disekinî. Lewre paş bizavên nerazîbûnên piştî hilbijartinên gera 10'mîn a Serokkomariyê, bi eşkere piştewaniya van bizavan di kir û rexne û nerazîbûna xwe jî li dijî rejîmê û riftarên dezgehên serkutker yên rejîmê bi nisbet girtin, îşkence û kuştina neraziyan dianî ziman. Hêjayî gotinê ye ku li vê dawiyê de navhatî xwendin û nivîsandina netweyên Îranê bi zimanê zikmakî yên xwe bi mafek sirûştî dizanî.

Bi koça dawiya Muntezirî neraziyan yek ji piştewanê serke yê xwe jidest dan, ku him li warê ayînî û him jî wekî kesatiyek neraziyê rejîmê, xwedî pêgehek taybet bi xwe bû.

Partiya Demokrata Kurdistana Îranê bi boneya koça dawiya Ayetula Muntezirî serxweşiyê ji malbata wî, peyrew û "moqelidên" wî dike û hêvîxwaz e ku li domandina rêya xwedêjêrazî de berdewam bimînin.

Partiya Demokrata Kurdistana Îranê
Komîsyona Ragihandinê
20.12.2009'ê Zayînî (29.09.1388'ê Rojî)

Li Bajarê Hewlêrê Xwenîşandanek Bo Piştgirîkirin Ji Girtiyên Siyasî Yên Kurd Li Suriyê Hat Lidarxistin

Roja 10ê Kanûna 2009'an, li hember bersivnedana rejîma Suriyê bi daxwazên girtiyên siyasî yên Kurd di girtîgeha "Edra" de, li hember deriyê saziya UN li bajarê Hewlêrê meşek birêve çû.

Di destpêka vê xwenîşandanê de ku bi sedan kes ji xelkê her çar perçên Kurdistanê beşdar bûn daxuyaniya "Kampayna Piştevanîkirin ji Girgiyên Siyasî ên Kurd li Suriyê" ji alyê du kes ji endamên vê kampaynê ve bi du zimanên Kurdî û Erebî hat pêşkêşkirin. Di wê daxuyaniyê de, behsa rewşa ne baş ya tendurustiya girtiyên siyasî hatibû kirin ku di hepsên takekesî yên teng û tarî û pîs û di bin îşkencan de dijîn. Eva di demekî de ye ku dewleta Suriyê di sala 1996'an de her du peymanameyên navnetewî yên sala 1969 û herwiha di sala 2004'an de carnameya dijî îşkenceya sala 1984'an îmza kiriye.

Di dawiya wê daxuyaniyê de, kampayn daxwaz ji civaka navnetewî û herwiha Rêxistina Mafên Mirovan kir ku bi armanca serbestberdana girtiyên siyasî ên kurd Li Suriyê, wî welatî bixin bin zext û givaşan û herwiha daxwaz ji Rêxistina Mafên Mirovan kirin ku heyetekî bijîşkî a ser bi saziya Mafên Mirovan bi mebesta lêkolînkirin li ser rewşa tendurustiya girtiyên siyasî bişîne Suriyê.

Di dawiyê de, xwenîşanderan bi bilindkirina druşmên wek "Em hez ji aştiyê dikin" "Bijî berxwedaniya gelê Kurd" "Bijî berxwadaniya girtiyên siyasî", daxwazên xwe pêşkêş UN kirin.

Hêjayî gotinê ye ku zêdetir ji 200 girtiyên siyasî yên Kurd di girtîgehên welatê Suriyê de di rewşekî pir xirab da ne.

www.kurdwakurdi.org

Xwekujî Wêstgeha Dawî

Hemîd Muxtarî



Xwekujî ne diyardeyek takekesî, belku riftar û berçawiyek civakî ye ku divêt wek pirsek civakî bikeve jêr lêkolînê û di warên saykolojîkî, malbatî, aborî, karî, yasayî û... bê vekeliştin û sedemên wê werin peydakirin, daku bikarin çareseriyek ji bo vê diyardeyê peyda bikin.

Piraniya xelkê dema ku ji jiyanê bêhêvî dibin û tu rêçareyekê bona çareseriya pirsên heyî ên xwe nabînin, wiha bîr dikin ku îdî tenê mirin e ku dikare wan ji pirsgirêkan rizgar bike û bibe çareseiyek ebedî ji wan re.

Xwekujî di pirraniya civakan de hebûye û heye. Anku her cihek ku mirov têde jiyan kiriye û dike, diyardeya xwekujiyê jî hebûye. Lê di hin civakan de asta wê pirr zêde û di hinekan de jî kêm e. Bêşik xwekujî di her malbat yan civakekê de rû bide, bandorên xirab û nigetîv dike ser civak û malbatê.

Li vir pirsek ku tê pêş, ev e ku çima xelk ji kal û ciwan, jin û keç, hemû û hemû ber bi vê diyardeyê diçin û bi vê rêyê ve dawiyê bi jiyana xwe tînin?

Bi raya civaknas û şarezayên xesarên civakî, xwekujî çendîn sedem hene ku emê li vir bi kurtî îşare bi hinek ji wan sedeman bikin.

Ew kesên ku xwe dikujin:

- Xemok in û tu hêviyek bi jiyanê ninin.
- Dê û bavên wan ji hevdu veqetiyane
- Di malbatên wan de her dem şer û kêşe di navbera endamên malbatê de heye
- Di xwendin û jiyanê de rastî şikistê hatine
- Ketine ber destrêjiyên atifî û seksî
- Ji dest nexweşiyên demdirêj û bê çareserî dinalin
- Bengdarê madeyên sirker in
- Li jiyanê bêzar in û bas ji mirinê dikin
- Tûşî bûyerên tal û dilêş hatine
- Tu kar û dahatek nînin
- Rastî zewacên bi zorî û neçarî hatine

Li gor lêkolînên ku hatine encamdan herqas xelk bêkar be, hizra xwekujiyê bal wan zêdetir xurt dibe û pitir ber bi aliyê vê diyardeyê ve tên rakişandin.

- Kirîza ferq û cudahî, newekhevî û girîngînedan bi dada civakî:

Vekolînên ku hatine encamdan, vê rastiyê derdixin holê ku newekhevî di her civakekê de vedigere ser nebûna dada civakî.

- Helatin ji zext û givaşên derûnî ku tê sehkirin qet bi dawî nahên.

Ji rêya xwekuştinê ve dixwaze hinek kesan biêşîne anku tenbîh bike:

Zarokên ku xwe dikujin dixwazin bi vî karî dê û bavên xwe biêşînin. Anku wek metodek nerazîbûnê li hember riftarên dê û bavên xwe de bikar tînin.

Baldanek bi wan fakterên ku me li jor de îşare pê kir, derdike kesên ku dixwazin xwe bikujin, tu hêviyek bona jiyankirinê nînin û bi sedemên cur bi cur li jiyankirinê mandî û bêzar bûne.

Di Îrana bin desthilata rejîma Komara Îslamî de herçend ku heya niha tu serhejmariyek dirust û cihê baweriyê derheq xwekujiyê nehatiye weşandin. Lê mixabin li vî welatî de pirr zêde ne kesên ku bi rêya xwekuji yê ve dawiyê bi jiyana xwe tînin. Zext û givaşên civakî ên di nava civaka me de jiyana xelkê pirr dijwar kiriye û bêhevîtî xistiye nav dilê wan de. Nebûna sîstemek birêveberî a demokratîk û kêrhatî û girtine dest a desthilatê ji aliyê komek melayên tarîperest ku tenê alîgirên xwe ji gişt waran nemaze warê aborî ve dabîn dikin û bi siyasetên xwe ên şaş û dûr ji yasa û orfên navnetewî, xelk xistine bin zext û givaşan û bi vê çendê jî hizra xwekujiyê di nava xelkê de bihêztir kiriye.

Rejîma Îranê ne tenê tu gavek bona çareseriya sedemên xwekujiyê hilnagre, belku bi xwe xelkê bo xwekujiyê hay dide. Bo mînak rejîma Îranê bi vekirina navendên 'Îstişhadî' di seranserê Îranê de û bi haydan û navnivîsîkirina xelkê bona xweteqandinê li dijî welatên wek Îsraîl û rojavayî... zêdetir vê diyardeyê xurt dike û bi pirrkirina mejiyê xelkê xapandina wan bi sozên direv ên olî (wek her kes li dijî Îsraîlê xebat bike û di vê rêyê de bê kuştin, şehîd û dê here cenetê) jiyana ser vê cîhanê bal xelkê pûç û bê biha dike û wan dişîne meydanên şer. Li halekê de ku bi xwe xwediyê baştirîn û xweştirîn jiyanê ne û bi milyard dolar ji bo xwe û kes û karên xwe paşkevt kirine û dikin!!.

www.arsivakurd.org

ZIMAN

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Ziman, her çendî ku wekî taybetmendiyeke xweser a mirovî were dîtin jî, ew tenê ne bertekeke ji rêzê ya ku mirov ji heyberên din vediqetîne ye. Her wiha ziman, deriyê zanîn û hişmendiya ku mirov arasteyî tekûzbûn û kemilîna herî berz û bilind dike ye jî. Digel pêşveçûna zimên, pêşveçûna pergala mêjiyê mirov û bastûra hişmendiya mirov jî tekûz dibe.

Zimanê civaka ku xwediyê feraset û perwerdehiyeke zanistî be û girêdayî vê yekê sinc, tevger û hewldanên zanistî lê hebe, teqez dibe xwediyê ziman û ramaneke zanistî jî. Pêwendiya navbera ziman û ramanê, pêwendiyeke zanistî ya bivênevê ye.

Ziman û hişmendî du behreyên mirov in ku bi zanînê re pêşve diçin. Her mirov digel behreya zimên bi destkeftina ramîn û axaftinê re ji dayîk dibe û rê rêçikên zimanê ku pê diaxive, fêr dibe. Tu mirov, nikare li derveyê civak û civatê bijî an bêyî der û dora xwe fêrî zimanê xwe yê zikmakî bibe. Ziman, tenê ne navgîna axaftinê, herwiha jêder û çavkaniya zanînê û çeq û pîvanga zanyariyê ye. Belê, ligel her tiştî, zimanê mirov li gorî zanîn û zanyariya mirov dişêwe û teşe digire.

Du pergalên zimên ên, ku di domana peresîna fîzyolojî û biyolojiya mirov de bi civakîbûna wî/wê re derdikevin holê, hene. Her mirov zimanê ku di zarokatî an ciwaniya xwe de fêr dibe/bûye, bi kar tînê. Mirov, ji roja ku ji dayîk bûye û heta îro çi têgihên ku bi dest xistine, hemû têgihên wî zimanê ku ji der û dora xwe fêr bûye û di binhişîna xwe de bi cih kiriye ye.

Di civaka ku zanîn û teknolojiyê hildiberîne de gelek têgihên zanînê yên ku di pergalên zimên de cih digirin, hene. Û ev têgih xwe dispêrin bikaranîn û xebitîna peyvên nûjen ên gerdûnî. Geşedaniya têgihî ya ku di domana perwerdehiyê de pêş ve diçe, li hin têgihên nû yên din dadigere. Têgihên zimên ên ku ji hêla civakê ve pêk tên, tev girêdayî awa û şêwaza jiyanê, têkilî nêrîn û ferseta civakê, têkilî têgihîştin û binavkirina dab û gerdîşên civakî, têkilî dîrok û erdnîgariya civakê, têkilî aborî û rabirdûya civakê... û hwd. teşe digirin û dişêwin.

Her civak li gorî pêdivî û hewcehiyên xwe yên rojane zimanekî pêk tîne û zimanê xwe li gorî merc û derfetên jiyanê û geşedaniya demê nû dike û diguherîne. Takekes dibe, civak dibe; hîndekarî, perwerdehî, ceribandin, hişmendî û derûniya xwe li gorî axaftin û vegotina xwe ya ku bi vî zimanî bi dest xistiye, dixebitîne. Ji bo wê, divê ziman tu car wekî komiçk an jî navnîşka gotin û biwêjên bêwate an jî gencîneya çend peyvên biwate neyê dîtin û pejirandin. Ji lewre ew, gelek pergal û bastûrên mezin ên din (ên têgihî) di xwe de dihewîne. Heke mirov bi vê ferasetê tevbigere û di vê çarçoveyê de nêzîkî zimên bibe, wê gavê dê ziman li gorî kêmbûn û zêdebûna gotin û peyvan, an qels an jî dewlemend, bihesibîne. Ev nirxandin jî gelekî jî dûrî qistas û krîterên zanistê ye.

Ziman, pîvanga hebûna mirov e. Jiyana mirov li gorî rewşa aborî an jî awa û mercên hilberînê teşe digire. Hebûna mirov li ser riknê sêpêka civak- çand û raman tê rûnandin. Têkiliya navbera ziman û ramanê bandoreke mezin li ser mezrîngeyên civakî dihêle û gelek nirxên nû hildiberîne. Hilberandin û afirandina alav û amrazên nû yên hilberinê, digel zêdebûna peyv û biwêjên nûjen, hişmendiya civakê xurtir û hûnandina tevn û tora têgihên zimên jî nûjentir dike. Hem bedewkariya ber û berhmên hunerî û hem jî qesr û qonaxên bihişmet ên ku bi hostetî hatine avakirin, hemû ji wan peyvên ku li ziman zêde dibin pêk tên û qîmetdar dibin.

Pergala zimanê civakê bastûra mezrîngeyên civakê ye jî. Bi awayekî giştî, mirov dikare bibêje zimanê dadê, zimanê hunerê, zimanê wêjeyî û girêdayê wê zimanê helbestê hemû ji zimanê civakê der dibin. Xurtbûna zimên û xurtbûna sazî û dezgehên civakê li hevdû derdikevin. Ji bo nimûne, heke di civakekê de hunera destkariyê pêş ve çûbe, gêrêdayî wê têgih û bêjeyên wê, ango zimanê hunera destkariyê jî pêş ve diçe.

Pêwendî û girêdaniya ziman û ramanê bandoreke mezin li ser jiyana mirov a civakî dihêle. Ev bandor û hevhîkariya navbera ziman û ramanê, gelek hêmayên çandî derdixe holê û guherîn û veguherînên civakî pêk tîne. Ziman, wekî ber û berhema mêjiyê mirov ê herî gihaştî tê qebûlkirin. Belê mêjî raman û hişmendiya mirov jî bi saya zimên tekûz û kamil dibe.

Di civakê de ber, bergeh û dîmendariyên afirîndetî an jî hilberîneriyên ku bi hizr û ramana mirov re der dibin, xwe dispêrên hêz û xurtbûna zimên. Û ev ziman jî, zimanê zanistê bi xwe ye. Belê zerengî(kapasite) û çawaniya zimên a ku girêdayî ramana zanistî pêk tê, xwediyê gelek rist û rêbazên resen û xweser e jî. Zimanê zanistî, ligel ku ji zimanê civakê dinime jî, tu carî bi zimanê rojanê yê civakê nayê ser. Lewre, zimanê zanistê bi gelek têgih û azîneyên xwe yên resen û xweser, xwediyê pergaleke ciyawaz û cuda ye.

Kaniya Helbestan

Mueyed Teyîb



Îraq

Şeva wê gur e
Roja wê kêr û serbirîn
Hindî dîrokê li bîre
Sê rûbar lê herikîn
Dîcle,
Firat û
Xwîn.

Şehîdê pêşmerge

Li bejna te û bejna çiyayekî bilind
Befir barî
Ger tifeng bi milê te ve neba
Agir di sîngê te de neba
Kî da zanît
Bejna te ka û
Bejna çiyayê bilind ka?
* * *
Wekî Memê Alan û
Zîna Zêdan
Tu û çiyayê bilind razan
Ger sorgula li ser sînga te govend neba
Kî da zanît ka sînga te û
Sîngê bilind ka?

Têhin

Têhinî ji deriyayê bar kir
Qesta kaniyeka sar kir
Roja gehiştî
Ew demek bû
Havînê ava wê vexwarî û
Kevizê derê wê girtî
Li ser milê xwe nezivirî
Serê xwe dana û mir
Çipkeka avê jî gewiriya wê ter nekir

Jêder: duhok writers.net

www.aramaudi.org

Ferhenga Dengan Di Zimanê Kurdî De

Ferhenga Dengan Di Zimanê Kurdî De, Pirtûkek nû ye ku li pirtûkxaneya Kurdî zêde bû. Pirtûk ji berhevkirina mamoste Ebas Îsmaîl e. Çend rojan berî niha li Şamê ji rex weşanxaneya Dar Elzeman ve hatiye çap û belav kirin.

Serê çend salan bû ku mamoste Ebas li ser vê pirtûkê dixebitî, taku wiha berhev kiriye. Ji gelek jêder, çavkanî û civata kurdî sûd û mifah wergertiye, ta ku bi vî rengî bedew amade kiriye. Ji tîpa A dest pê kiriye û li gor her tîpekê dengên ku ji Mirov, Lawir, Şêr, Gur, Piling, Beq… Dengên bêcanan, Teyr û Tilûran, Mih û Berxan… bi kurdî û hember wan jî bi erebî nivîsandiye. Pirtûk ji 136 rûpelan pêk tê.

Hêjaye gotinê ku mamoste Ebas Îsmaîl di sala 1938'an de li gundê Sada Cizîrê ji dayîk bûye, di sala 1962 an de bûye mamoste û wiha gelek şagirt li ber destê wî mezin bûne ku niha bûne duktor, endezyar, wekîl û… Ji ber kevinbûna wî, ku ew ji pêşengên mamostayên kurd e li Cizîrê bi navê mamoste Ebas hatiye nas kirin. Jiyana wî di gelek qunaxan re derbas bûye, gelek kar û barên têvel di jiyana xwe de kirine, wiha jî yên konevanî; di destpêkê de endamekî aktîv yê Partiya Komenîstên Sûriyê bû, vê dawiyê ji ber mêldariya wî bi rex kurdatiyê, dûrî Komenîstan ket û wek kurdekî welatparêz ê serbixwe dest bi nivîsîna bi zimanê kurdî kir û ta niha çend pirtûk berhev kirine ji wan:

Gula Civatê (1995),
Çîvanok û Pêkenok (1996),
Em beranên ber kêrê ne (1998),
Xelata Mandêla (1999),
Stêr û bêr (2004),
Fêrbûna Zimanê Kurdî (2005)



Çend goşî ji mêwa jiyana min, 2006 Em jî bi dil û can pîrozbahî û spasiya mamosta Ebas dikin bo vê berhema binirx, û herweha hêviya berdewamî û serketinê jêre dikin

Kultura Kurdî Li Zanîngeha Ezherê

Muftiyê Misirê biryar da çand û kultura kurdî bikeve nav programên Zanîngeha Ezherê û têde bê xwendin. Zanîngeha Ezherê, mezintirîn merciya zanistiya Îslamî di seranserê cîhanê de ye ku têde zêdetir ji mîlyonyek mamoste, xwendkar, rewşenbîr, pisporên zanistên îslamî û dînî dixwînin û dersê didin.

Birêveberê ragihandina Wezareta Diyanetê ya Kurdistanê, Merîwan Neqşîbendî ragihand şandeyeke bi Serokatiya Wezîrê Diyanetê, Kamîl Hacî Elî serdana Misirê kiriye û li wir serdana mamosta û xwendkarên kurd

kiriye ku li Misirê dixwînin û beşdarî xulên bihêzkirinê dibin.

Şandeya Kurdistanê paşî serdana Şêxê Ezherê, Muftiyê Misirê, Serokê Zanîngeha Ezherê, Berpirsên mezin ên Wezareta Diyaneta Misirê kiriye û digel wan civiyane ku di encamê de çendîn destkeft ji bo mamostayên dînî, xwendkarên kurd û rewşa dînî ya li herêma Kurdistanê hatine bidestxistin.

Destkefta herî girîng jî biryara Muftiyê Misirê ye ku biryar daye çand û kultura Kurdî daxilî programên Zanîngeha Ezherê bê kirin ku ev cara yekê ye di dîroka Zanîngeh û Merciyên îslamî yên cîhanê de îtîraf bi çand û kultura kurdî tê kirin û dikeve programên perwerdeyê de.

Her weha biryar hatiye dayîn heimara xwendkarên ku li Zanîngeha Ezherê tên wergirtin bên zêdekirin û têkiliyên zanistî yên navbera Zanîngeha Ezher û Zanîngehên Kurdistanê bên xurtkirin

Welatperwer

Serpêhatiya Elî Helebçeyî Dibe Fîlmek Dokumentî

Elî Helebceyî ku di karesata Helebceyê di Çilrojiya xwe de wenda bibû, ji aliyê jinek Îranî ya bi navê Kubra ve hatiye mezinkirin piştî 21 salan vegeriya welatê xwe û gihişte malbata xwe.

Piştîwan Gulpî û Sîrwan Mihemed bi hevkariya kanala Kurdsatê serpêhatiya Elî kirine fîlmek dokumentî.

Piştîwan Gulpî li vê derheqê de dibêje:" Ev çîroka rastîn, biserhateke mezin e û nabe bihê piştguh xistin. Lewra me got em karekî wiha bikin û serpêhatiyên wî bikin fîlmeke dokumentî. Fîlm qala destpêka

hatina Elî bo Kurdistanê dike, paşan Elî bi xwe qala hatina xwe, kontrola DNA'yê û dîtina malbata xwe dike. Beşek ji karê wênegirtinê yê fîlmê temam bûye û me dil heye di heftayê bê de dîmenên din ên jiyana Elî ya zarokiya wî ya li bajarên Meşhed, Kerec û Tehranê bigirin."

Pirsa Elî, ne pirsa malbatekê, pirsa neteweyekê ye. Merasîma bihevgihîştina Elî û dayîk û malbata wî, hemû Kurdistan hejand û rondik ji çavên hemûyan barandin.

Piştî ku kuntrola DNA'ê ji bo çend malbatên Helebceyî hate kirin û encamên wê digel DNA'ya kurê Helebceyî hatin berawirdkirin(hemberkirin) ku di karesata kîmyabarankirina bajarê Helebçeyê de wenda bibû. Elî piştî karesata Helebçeyê li Îranê di êtimxaneyekê de bicî bûye, paşê jî jineke xelkê bajarê Meşhedê xwedî li wî derketiye.

www.navakurd.org

Şiroveya Gotinên Pêşiyan

Beşa 7



Çiya Mazî

wekî ku mirov ciwan be, jêhatî ye ,lê pîr dibe, ji tiştekî re nabe an ji hindik tiştan re dibe.

Wexta genim giha bû, kes nexwiya bû; bû firîk, Heso Hemo bûn şirîk:

Dema kar kes xwe nade ber, lê dema hazir be, gelek kes xwe lê digirin.

Wexta kar rûyê xwe diguherîne,wexta şîvê kevçiyan tîne:

Dema kar xwe dixeyidîne, lê xwarin tê, ew jî ji bo bixwe, tiştekî biçûk dike.

Xal xidiro, hero li viro:

Her dem xuyayî ye. Ji bo mêvanên ku her tim diherin û tên hatiye gotin.

Xwarin li ber kir, çû raserî ser kir:

Xwarin didêyê, lê mineta xwe li serî dike an tiştekî jê dixwaze.

Xwestek û kodik bi şûn de:

Wekî ne parsek be, ne fedî bike ji bo xwestinê.

Ya ji mam re, ya ji xal re:

Ji bo qîzên ku di bin bandorê de tê zewicandin, hatiye gotin. Ji bo tiştê ku mirov bixwaze bifiroşe jî tê gotin. Kî dibe bila bibe.

Ya nare diziyê, ya jî dihere, şivan dikuje:

Ya xerabiyê nake, yan jî dike pir tund dike. Yan tiştekî karekî nake, yan jî dike pir nebaş dike.

Yarê diya mi yek bûya, minê bi dendikên bihîvan xwedî bikira

Weki dijminê min, neyarên min pir in.

Yek ta nabe, du ta, tê ranabe:

Wekî; aliyekê çal e, alîkî behr e. Rêyek li navê tune ye. Ji bo karê ku dikeve tengasiyê.

Yê ji derve hat, yê hundir qewirand:

Wekî têkiliya yekî di karekî de tune be lê dema peyv vedibe, rexneyê li yê têkiliya wî bi kar re hebe, dike.

Xwediyê tirê, li xwe mikurê:

Divê mirov bangî xwediyê karê pîs bike ku li xwe mikur bê. Ev pirseke ji wî kesî re ye.

MÎNAKINE BIWÊJÊN TIRKÎ Û LI HIMBER WAN YÊN KURDÎ:

Doğduğuna pişman olmak (ji çêbûna xwe poşmanbûn)

Di Kurdî de (li emrê çûyîn poşmanbûn)

Dokuz köyden kovulmuş olmak (ji neh gundan qewirandin)

Di Kurdî de(mirovê bêar, li derekê nekir sitar)

Dîze gelmek (hatina çongê)

Di Kurdî de (hatina dest û piyan)

Olmayacak duaya amîn demek(duayê ku nebe, jê re amîn gotin)

Di Kurdî de(me ji vê duayê re negot amîn)

Mantar gibî yerden çıkmak(wekî kuvarikan ji erdê derketin)

Di Kurdî de (wekî bizrê kulî ne)

O kaldırım muhendîsîdir(ew endezyarê rê ye)

Di Kurdî de (ew beqan dixesîne - ew kêçan dixesîne – ew sa xwê dike)

Dîmyata pîrînce gîderken evdekî bûlgurdan olmak (yê ku çû dimyatê ji bulxura malê ma)

Di Kurdî de (çû heyfa bavê, quna dê li ser kir)

Nûh der peygamber demez (dibêje Nûh nabêje pêxember)

Di Kurdî de (ew her tim dibêje barê êzingê min)

DI DU PIRTÛKAN DE GOTINÊN PÊŞIYAN Û BIWÊJ:

Di nava pirtûkên ku bi navê gotinên pêşiyan û biwêjan hatine weşandin yek jê ya Ahmet Zekî ÇAMLIBEL ya bi navê "Îdiyomên Kurdî" ye . A.zekî ÇAMLIBEL di pirtûka xwe de biwêjan wiha şîrove dike: Qalibek û çarçoveyek idiyoman(biwêjan) tune ye. Tevlî ku teoriya wan zelal nebûye jî cûdatiya idyoman heye. Carinan hevokek, carinan peyvek bûye idyom. Mînak:

Agir birrîn,
Agir bûye ketiye canê me,
Bi Per û bask bûyîn,
Cila xwe ji avê derxistin,
Çavgirtî,
Rê pêketin.
Tême çavê te,
Rûnê helandî,
Helal be ji te re,

Ji pirtûkên Gotinên pêşiyan yên ku heta niha derketine yek jê jî ya A. BALî ye. Ez dixwazim şîroveya Brêz A.Balî jî li vir bi cîh bikim . Ez bawer dikim ew jî dê sûdeyekê bide lêkolîna li ser gotinên pêşiyan.

"Gotinên pêşiyan; rêzepeyvên, ramanên hevpar,bawerî û tevgerên netewan nişan didin û rê bi ber mirovan dixin û dersdar û bi wate nin.

Gotinên pêşiyan ku bi qasî dîroka welatekî kevn in, ji ceribandin û ramanên girseyên gelan ku bi sedsalan jiyane, pêk hatine. Ji bo ku mirov netewekê ji nêz ve nas bike, divê mirov pêşî gotinên pêşiyên wan lêbikole. Ji ber ku tiştê netewan bi mirov didin naskirin û vedibêjin gotinên pêşiyan in.

Gotinên pêşiyan ku pêşiyan jê re gotine "Darbimesel", neynika gelekî nin. Ev Peyvên ku pendê dikin,dab û nêrînên gelan, li gorî pejirandina civakê,pêhesandinê çêdikin,carinan dûrî demê jî dimînin. Mînak; peyeveke di demeke dîrokê de bi wate, ku çend sedsal di navberê re derbas bin, dikare winda bibe an bê wate bimîne û ji peyvên rojane re nabin mînak. Hejmarên van gotinanên wiha ne ewqas pir in.

Bi gelemperî; ji bo vegotin û fêmkirina mijarên rojane, axivger,ku pêwist be cîh didin gotinên pêşiyan. Mirovên herî zanepeyv ew in ku, dema axaftinê, gotinên pêşiyan bikar tînin.

Gotinên pêşiyan; hevokên ku peyvên di nava wan de, yên bi demê re bê wate mane, bi bin bêjingê ketine û bi bikaranînê re peyvên mayî bûne qalib in. Lê belê carinan bêyî ku wateya wan winda bibin, ji bo melodiya vegotina mijaran, carinan hatine guherîn. Belê ev mudaxeleyana tucar nebûne sedema guherîneke bingehîn". (*Ji Tirkî werger:Ç.Mazî*)

Pirtûka Brêz A. Balî, bi navê "Gotinên pêşiyên Kurdan" çapa yekemîn di sala 1993 ji weşanxaneya Pelê Sor hatiye çapkirin. Li gor brêz A.Balî di pêşeka pirtûkê de diyar dike ku ji 4 hezar gotinên pêşiyan pêkhatiye.

Lê belê dema mirov li van gotinana dinêre,(wekî wî jî gotiye), mirov dibîne pirên wan,hema bibêjin ji sedî 70 biwêj in.

Mînak:

Agir ber piyê wî dibe av

Agirê bin kayê ye

Biçe ser kaniyê wê ziwa bibe
Bihar hat zivistan hilat
Bûka bi dilê zava ye
Dayê ewa tu dibêjî min li der daye
Ez dibêjim bira, ew ji min re dibêjî kirîv
Gaziya li dûv girî ye
Lawê mencê çû qezencê
Li nalê jî dide û li bizmarê jî
Wekî melevanê dixeniqe
Mirîşka reş e her0 diro nexweş e
Ne dixwim nanê te ne dajom horîka te

Rûto xeber pûto

Zimanê wî nebûya wê qijika çavê wi derxistana
Zîvir zîvir dîsa li vir

.....û her wekî din. Mirov dikare hê pir mînakên wisa bide. Lê belê heke mirov ji gotinên wiha re bibêje "gotinên pêşiyan" nayên hesêb û hejmara wan bi deh hezaran in. Gotinên pêşiyan ji biwêjan tê cûdakirin û ji wan hindiktirin. Biwêj, di nava zimên de bicîh bûne û bûne hêmanên hevok û zimên.

Lê gotinên pêşiyan ne wiha nin. Kesek heta ku tiştekî nîşan nede an rexneyekê neke, dikare gotinên pêşiyan nebêje. Lê biwêj carinan bi xwe têne gotin û bêyî ku mirov bibêje ev biwêj in jî. Em dîsa mînakekê bidin; Wekî mirov ji yekî re bibêje "*ew kes pir guhgiran e*" mirov nizane ku biwêj hatiye bikaranî,n lê " *guh giran*" bi xwe biwêj e.

www.arsivakurd.org

agiri

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com

Peykerê Şivan Perwer Hat Çikandin

-Li navçeya Sêwrega Rihayê, peykerê hozanê mezin yê kurd Şivan Perwer hat çikandin. Peyker ji alî Şarevaniya navçeyê hatiye çêkirin.

Peyker ji ew wêneyê naskirî ku di destekî Şivan de tembûra wî û destê wî yê din jî bilindkirî û çarmêrkî runiştiye, hatiye dîzaynkirin. Peyker 3 m bilind e.

Cîgirê Şaredar, Mustafa Hîvi Abikoglu dibêje: Dê di rojên pêşde merasîma vekirina peykerê hozanê mezin çêkin û ew ê Şivan Perwer jî daweti merasîma fermî bikin.

Hêjayî gotinê ye beriya demekê jî, Şaredariya Sêwregê ragihandibû ku ewê peykerê hemû hozan, hunermend û yên naskirî yên Sêwregîyan biçikînin. Beriya demekê jî Peykerê artîstê navdar, Yilmaz Guney ku bi eslê xwe ji Sêwregê ye li qada bajêr hatibû çikandin.

netkurd

Îdam Ji Ber Evînê!

Li gor çavkaniyên nûçeyan, Mislih Zemanî, xelkê bajarê Sine ku di temenê 17 saliyê de bi tawana evîndariyê û hebûna pêwendiyên neşerîî tevî dosta xwe hatibû girtin, sibêdeya roja Pêncşem, 17.12.2009an, tevî 4 kesên din li girtîgeha Dîzilabad a bajarê Kirmaşanê de hate îdamkirin. Biryara îdama navhatî li Dadgeha bajarê Sine de hate dayîn û piştre di Dadgeha Bilind a welat de hate pejirandin. Serbarê vê yekê ku Mislih Zemanî ji aliyê dosta xwe û malbata wê ve hatibû efûkirin, lê dadgehê li ser biryara îdama wî tekez kir. Hêjayî gotinê ye ku Mislih Zemanî, Piştî mana 6 salan li girtîgehê de, bêy girtina tu parêzerekê, li girtîgeha Dîzilabad de hat îdam kirin. Li halekê de ku Îranê jî Peymannameya Cîhanî ya Mafê Zarokan wajo kiriye, lê ev yeke tu car berçaw negirtiye. Herweha di rapora îsal ya Efûya Navneteweyî de jî hatiye ku Îran take welat e ku li ser îdama tawanbarên nûciwan û birêvebirina cezayên nemirovî weke Kewirbaranê berdewam e.

Bo Jidayîkbûna Xortekê Li Seqizê de, 7 Roj Û 7 Şevan Govend



Hevwelatiyekî bajarê Seqizê ku midehê 29 salan e jiyana hevpar pêk aniye û 8 zarokên keç hene, tim li benda zarokek xort de bûye û hertim bi hesret ve mêzeyî xortên xelkê kiriye. Lê tu car jî bêhêvî nebûye. Aqibet hefteya borî li serûbendê 30'mîn salvegera jiyana xwe de xweda kurek da wan. Piştî vê bûyerê biryar dank u heya 7 roj û 7 şevan cejn û şadiyê lidarbixin. Lê ji ber hatina meha Muhermê li Îranê de nikarin vî cejnê birêve bibin. Lewre biryar dane ku li meha pîroz a Mewlûdê de vê ahengê lidar bixin

Rejîma Îranê Neraziyan Weha Rûmetşikandî Dike

Rejîma îslamî ya Îranê bona ku pêşî li maxalefetê bigre, her rêyekê bikar tîne. Wêneyê çalakvan û Serokê Xwendekarên nerazî bi çarşef û sergirtî hate belavkirin. Ev jî rêyek ji şerê rejîma îsalmî ya li dijî mixalifan e. Desthilatdarên îranî wêneyê Serokê Xwendekarên nerazî yên Zanîngeha Amir-Kabîrê, Majîd Tevekulî ku xwedêgiravî piştî axavtina xwe ya li Zanîngehê xwestiye birevê li medya nêzî hikûmetê belav kir. Di wêne de Tevekulî bi Çarşefek reş, sergirtî û weka jinekê xwe girêdayî, dixuyê. Lê şahidên girtina Tevekulî dibêjin dema Tavakulî hate girtin, ne biçareşef bû û bi cil û bergên mêran, hate girtin û hikûmet dixwaze wî bi vî awayî rûmetşikandî bike.

Rojnamevanên Ku Îsal Hatine Kuştin, Hejmarekî Rekor E!

Di sala 2008'an de rojnamevanên ku hatibûn kuştin li hemû cîhanê de 42 kes bûn.

Îsal jî ev hejmar gihîşte 68 kesan! Filîpînê welatê ku 32 rojnamevan têde hatine kuştin, cihê yekemîn digire. Îraq her sal cihê sereke distand, lê îsal daket rêza 3'emîn. Somalya jî di rêza dûwemîn de ye. Welatên ku rojnamevan têde hersal tên kuştin, çend ji wan ev in: Srîlanka, Mikzîk, Azerbaycan, Endonizyî, Elsalvador, Îran, Kolombiya, Tirkiye, Kinya, Nipal, Nîciriye, Magadaskar û Afxanistan.

Netewe

www.agiri.org